

# Şêx Muhyedînê Hênî: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê Sheikh Muhyedin Heni: An Important Representative of Food Theme in Kurdish Literary

Abdurrahman Adak\*

## PUXTE:

Şêx Muhyedînê Hênî (k.d.derdora 1897an) yek ji girîngtirîn helbestvanê klasîk ê serdema piştî mîrektîyan e. Paşxana wî ya edebî, wekî piraniya helbestvanên wê serdemê Xalidîtiya Neqşebendî ye. Lewra bavê wî bi xwe postnişînê şaxa Xalidiyan a Hênê bû. Şêx Muhyedîn ku mexlesên wî Sa'î û Heqî ne, hem li pey şopa Melayê Cizîrî helbestên klasîk nivîsîne, hem jî di mijara xwarinê de menzûmeyerke serbixwe nivîsiye. Di wê serdemê de li Hênê û Aqtepeyê di nivîsîna helbestên bi temaya xwarinê de bizaveke edebî derketiye meydanê. Bi qasî ku tê dîtin, di tarîxa edebiyata Kurdi de yegane helbestvanê klasîk ê ku di vî warî de berhemeke serbixwe nivîsiye Şêx Muhyedîn e. Ji ber ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de di mijarên ladîni-beşerî de berhemên serbixwe kêm in, ev berhema nivîskar girîngiyêke taybet bi dest dixê. Berhema ku bi qasî 20 kom û 130 cureyên xwarinê di xwe de dihewîne, bi şêwazêke edebî xwarinên Kurdan ên serdema nivîskar, pênasayên wan û menûya ser sifreyê radixe ber çavan. Berhem ji vî aliyê ve wekî berhemeke pêşserdemî dikare bê hesabandin.

**\* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin  
Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê,  
Beşa Zîman û Edebiyata Kurdî,  
Mêrdîn, Turkiye**

Assoc. Prof. Mardin Artuklu  
University Faculty of Literature,  
Department of Kurdish Language  
and Literature, Mardin, Turkey  
e-mail: abdurrahmanadak@gmail.com

**Bêjeyên sereke:** Şêx Muhyedînê Hênî, Xalidîti,  
simatiye, xwarin.

## ABSTRACT:

Sheikh Muhyedin Heni (about 1897) is one of the most prominent poet of the period of after principality. His literary background, like most poets of that period, is based on Khalidy branch

of Nakhsibendi sect. Because his father was a sheikh of the branch of Khalidiy in Hênî. Sheikh Muhyeddin, whose pen names are Sa'i and Heqi, wrote classical poem on the road of Melayi Ciziri, he also wrote an independent poem on foods. On that period, a movement of writing poems contents of which were foods was emerged in Hênî and Aqtepe. As far as known, Sheikh Muhyeddin Heni is the sole classical poem who write an independent literary artifact on that issue. Because of the fact that the secular content are limited in the classical Kurdish poem, this work of Sheikh have a special place. That work which contains 20 group and 130 sort of foods, in a literary way presents the Kurdish kitchen of the period of the writer, their recipies and menus. In this aspect, that work can be seen as a futuristic work.

**Keywords:** Sheikh Muhyedin Heni, Khalidiyyah, simatiyyah, food.

## 1. DESTPÊK

Serdema piştî mîrektiyan, di nav qonaxên tarîxa edebiyata Kurdî de xwediye hin taybetiyên xweser e. Di vê serdemê de helbesta klasîk li ser terzê Melayê Cizirî dewam kiriye, edebiyata tekyayê pêş ketiye û di warên edebiyata dînî û ladînî/beşerî de jî berhemên orjînal hatine dayîn. Taybetiyeke di ya vê serdemê jî ew e ku medrese û tekyayên Neqşebendîtiya Xalidî wekî wargehên nû yên edebiyata Kurdî ya klasîk derketine pêş. Yek ji nûnerên girîng ê vê serdemê jî Şêx Muhyedînê Hênî ye ku ew bixwe endamê malbeteke Xalidî/Neqşebendî ye. Wî jî aliyekî ve kevneşopiya berê ya helbesta klasîk a standart domandiye, jî aliyekî ve jî di cureya simatiyeyê (temaya xwarinê) de menzûmeyeke resen daye. Simatiyeya Şêx Muhyedîn jî hemû simatiyeyên din bihecimtir e û jî aliyê edebî ve gelekî bi hêz e. Berhem herweha jî kêma berhemên edebî yên Kurdî ye ku di serdema klasîk de di warê edebiyata beşerî/ladînî de hatiye nivîsîn. Armanca vê gotarê ew e ku wekî nûnerekî girîng ê serdema piştî mîrektiyan li ser Şêx Muhyedînê Hênî û wekî nimûneyeke girîng a cureya simatiyeyê li ser simatiyeya wî bê rawestan.

Jêdereke klasîk ku rasterast jî bo Şêx Muhyedîn hatiye terxankirin nayê zanîn. Lêbelê derheqê bavê wî Şêx Ehmed Efendî de du jêderên girîng hene. Yek jî wan biyografiyeke ku jî aliyê birayê wî yê mezin Şêx Me'rûf ve derheqê bavê wan Şêx Ehmed Efendî de hatiye nivîsîn. Di vê biyografiyê de bi awayekî giştî derheqê zarokên Şêx Ehmed de jî agahî hatine dayîn. Ev biyografi hem derheqê malbata Şêx Muhyedîn, hem jî derheqê wî de gelek tiştan ronî dîke. Jêdere duyem a nivîskî jî berhema Ebdulmecid b. Muhemed el-Xanî ya bi navê *el-Hedaiqu'l-Werdiyye fi Heqaiq Ecillai'n-Neqşebendiyye* ye. Di vê berhemê de derheqê aliyê wî yê tesewifi de agahiyên girîng hatine dayîn. Di vê gotarê de jî bo ronîkirina jiyana Şêx Muhyedîn di serî de jî van her du jêderan sûd hatiye wergirtin. Ji bo mijarên ku di her du jêderên

navborî de tunene rasterast ji nûnerên girîng ên malbata Şêx Muhyedîn agahî hatine bidestxistin. Yek ji van nûneran Şêx Cahid e. Şêx Cahid kurê Şêx Mehmûd e, ew jî neviyê Şêx Me'rûfê birayê nivîskarê me ye. Me di sala 2008an de li Diyarbekirê li mala Şêx Cahid bi wî re hevdîtinek saz kir. Wê demê Şêx Cahid digel agahiyên zarekî yê girîng biyografiya ku bapîrê wî Şêx Me'rûf nivîsiye jî dabû me. Mixabin Şêx Cahid piştî hevdîtina me bi hefteyekê koçî dawiyê kir. Ev hevdîtî ji bo ku di sempozyuma Liceyê de di gotara me ya derheqê helbestvanên Lice û derdora wê de em behsa Şêx Muhyedîn bikin hatibû saz kirin. Di encamê de di wê sempozyumê de behsa Şêx Muhyedîn û herweha behsa neviyê wî Şêx Heybet jî hat kirin û gotar di pirtûka sempozyumê de hat çapkirin. Nûnerê duyem jî Mela Ehmed e. Mela Ehmed kurê Şêx Heybet e, ew jî neviyê nivîskarê me Şêx Muhyedîn e. Bi vê minasebetê em ji Şêx Cahid re bexşandina Yezdanê Dilovan daxwaz dikin û ji Mela Ehmed re jî spasdarî û minetdariyên xwe pêşkêş dikin. Ebdulxaliq Arca ku pêwendîya me bi her duyan re saz kir spasîyên ji dil heq dike. Hemîd Kılıçaslan jî derheqê tarîxa malbatê de hin agahiyên zarekî dan me. Em ji wî re gelekî spas dikin.

Metnê simatiyeya Şêx Muhyedîn derveyî sînorên vê gotarê hatiye girtin. Hem faksîmîle, hem jî latînzeya simatiye û helbestên Şêx Muhyedîn ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve bi hev re hatine çapkirin (Weşanxaneya Peywendê, Stenbol 2015). Ji ber ku bidestxistina wê gunca e, me pêdawistî nedît ku em jimareyên beytên ku di gotarê de wekî nimûne hatine pêşkêşkirin ji nusxeya orjînal nîşan bidin. Bi vê minasebetê ji bo ku nusxeya destxet a metnê menzûmeyê da me em ji Tarînî re spasîyên xwe pêşkêş dikin.

Di gotarê de pêşî nasname, malbat, serdem û Xalidîtiya Şêx Muhyedîn hatiye zelalkirin, piştî jî bi firehî li ser aliye wî yê edebî hatiye rawestan. Di çarçoveya aliye wî yê edebî de jî pêşî mexlesên wî, derdora wî ya edebî û helbestvaniya wî ya klasîk hatiye pêşkêşkirin, piştî jî bi taybetî simatiyeya wî û cihê wê di tarîxa edebiyata Kurdî de hatiye destnîşankirin.

## 2. ŞÊX MUHYEDÎNÊ HÊNÎ: NASNAME Û JIYANA WÎ

Navê helbestvanê me yê tam Şêx Muhyedînê Hênî ye. Navê bavê wî Şêx Ehmed, navê diya wî jî Emîne ye. Texmînî di sala 1849an de hatiye dinyayê (Jêder: Şêx Cahid). Diya wî Emîne keça Ebdullah Efendiyê Karazî ye û ji ber ku li Karazê koçî dawiyê kiriye li wir li goristana malbatê hatiye veşartin. Ji diya wî berî wî du xuşkên wî û piştî wî jî xuşkeke wî çêbûye. Lêbelê van her sê xuşkan jî di zaroktiyê de koçî dawiyê kirine. Loma Şêx Muhyedîn ji diya xwe tenê ye (Maruf, r.4). Ji van agahiyan derdikeve meydana ku cihê jidayîkbûna wî Karaz e. Çawa ku em dê li jêrê behs bikin, piştî wefata diya Şêx Muhyedîn, bavê wî mala xwe biriyê Hênê. Loma jî zaroktiya wî li Hênê derbas bûye û piştî bi bal Hênê ve hatiye nisbetkirin.

Li gorî agahiyên ku ji neviyê Şêx Muhyedîn Mela Ehmed hatine berhevkerin ku wî jî ev agahî bi endamên dî yê malbatê dan piştrastkerin, Şêx Muhyedîn ji bo ku perwerdeyê bibîne çûye Mêrdînê û li wê derê wî û Şêx Ebdurehmanê Aqtepî bi hev re perwerde dîtine. Dema ku li Mêrdînê bûye ji bavê xwe re nameyêke menzûm ku bi vê beytê dest pê dike, rê kiriye:

Eya ey Şêx Ehmedê Hanî

Meded ya Qutbê Geylanî

Careke ku ji Mêrdînê ji bo serdanekê hatiye Hênê, li ser daxwaza bavê xwe Şêx Ehmed Efendî hew vegeriyaye Mêrdînê û li wir di medreseya bavê xwe de ku îro jî li Hênê wekî 'Hicreya Şêx Ehmed Efendî' tê naskirin, li cem birayê xwe yê mezin Şêx Me'rûf perwerdeya xwe domandiye. Piştî ku li wir perwerdeya xwe xilas kiriye, bi qasî çend salan bi malîtî li gundên Liceyê yên bi navên Balicnê û Zobrînê maye û li her du gundan jî dersdarî kiriye. Yek ji melayên naskirî ku li van gundan li cem wî xwendiyê Mela Mihemedê Tepecikê ye. Di navbera her duyan de têtikiliyeke taybet hebûye. Şêx Muhyedîn piştî mala xwe aniye Hênê û li wir jî di medreseya bavê xwe de dersdarî kiriye (Jêder: Mela Ehmed). Salih Begê Hênî (k.d.1925) ku xwarziyê wî ye li wê medreseyê pêşî li cem Şêx Me'rûf, piştî jî li cem Şêx Muhyedîn xwendiyê (Jêder: Şêx Cahid; Adak 2008).

Xîtabeta Şêx Muhyedîn gelekî bi hêz bûye. Li gorî rîwayetê dema miftiyê Liceyê Mela Ehmedê Esmâ ji Balicniyan re xîtabet dikir, gundiyan jê re digotin ku xîtabeta te jî wekî ya Şêx Muhyedîn xweş e (Jêder: Mela Ehmed).

Şêx Muhyedîn li dora sala 1897an de li Hênê wefat kiriye. Gora wî li Hênê, li cem qubbeya bavê wî ye (Jêder: Şêx Cahid).

Kurekî Şêx Muhyedîn bi navê Şêx Şewket û keçeke wî bi navê Emîne hebûne. Ji Şêx Şewket jî sê neviyên wî çêbûne: Şêx Heybet (Ji bo agahiyên berfireh derheqê Şêx Heybet de bnr. Adak, h.g., r. 435-436), Şêx Hesîb û Xanim (Jêder: Mela Ehmed).

### 3. JI BERIYÊ HETA HÊNÊ SERENCAMA MALBATA WÎ

Malbata Şêx Muhyedîn ku wekî 'Malbata Şêx Ehmedê Karazî' tê naskirin li Kurdistana Bakur yek ji girîngtirîn malbatên ilmî, tesewifi û edebî yê serdema xwe ye. Serokê malbatê Şêx Ehmedê Karazî ku bavê Şêx Muhyedîn e, di nîveka pêşî ya sedsala XIXem de li gundekî Midyadê yê bi navê Silîbînê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Umer e. Mela Umer jî ber pevçûnekê ji vî gundî koç kiriye û li herêma Bişêriyê pêşî li gundê Şêxçoban, piştî jî li gundê Girêsîra bi cih bûye. Mela Umer di zarokatiya Şêx Ehmed de koçî dawiyê kiriye û li goristana Şêxçoban hatiye veşartin. Ji ber

ku navê bapîrê Şêx Ehmed ê çarem Xidir e, ji wan re “Milanê Xidir” hatiye gotin. Vê malbatê berî Mela Umer jiyana xwe li deşta Mêrdînê bûrandine. Malbat ji aliyê binerih/nesebê ve bi riya Îmam Hesên digihîje Cenabê Pêxember (Maruf, r.2).<sup>1</sup>

Şêx Ehmed di medreseyên girîng ê Kurdistanê de perwerde dîtiye. Wî li Kurdistana Başûr li cem kurê Şêx Yehyayê Mizûrî Şêx Ebdullah xwendina xwe xilas kiriye û ji wî icazet sitandiye (Maruf, r.2).

Şêx Ehmed piştî ku xwendina xwe xilas kiriye li Girêşîra bi xanimeke bi navê Helîmeyê re zewiciye. Ji wê zarokên wan ên bi navê Me’rûf û Zeyneb çêbûne. Şêx Ehmed piştê koçî Karazê kiriye ku wê demê gundekî li ser Liceyê bûye. Çawa ku çûye Karazê xanima wî Helîme li wir miriye. Li wê derê ji malbata Bokariyan bi xanimeke bi nave Fatîme re zewiciye û ji wê jî zarokên wî M. Qasim û M. Nûrî çêbûne. Fatîme jî li Diyarbekirê koçî dawiyê kiriye. Vê care Şêx Ehmed li Karazê bi diya Şêx Muhyedîn Emîneyê re zewiciye. Lêbelê wê jî li wê derê koçî dawiyê kiriye. Jiyana Şêx Ehmed a li Karazê 7 salan dom kiriye. Loma jî wekî Şêx Ehmedê Karazî hatiye naskirin. Şêx Ehmed piştê ji Karazê derketiye û li Hênê bi cih bûye û li wê derê di sala 1301/1883/1884an de 63 salî koçî dawiyê kiriye.

Şêx Ehmed bi giştî bi 7 xaniman (Helîme, Fatîme, Xedîce, Emîneya Bokarî, Emîneya Karazî, Zehra û Esma) re zewiciye û ji van xaniman 13 zarokên wî çêbûne. Nivîskarê me Şêx Muhyedîn di nav 13 zarokan de yê çarem e. Berî Şêx Muhyedîn M. Maruf, Zeyneb, M. Qasim û M. Nûrî; piştî wî jî M. Masum, M. Refî, Şehzade, Leyla, Gulsum, Sehîme, Aîşe û Umer hene (Maruf, r.4-5.).

#### 4. WEKÎ ŞAXA XALIDÎTIYÊ YA HÊNÊ MALBATA ŞÊX MUHYEDÎN

Dema bi awayekî giştî li tarîxa edebiyata Kurdiya Kurmancî bê nêrîn dê bê dîtin ku berhemên edebî yên Kurdiya Kurmancî di du serdemên tarîxî de hatine dayîn: Serdema mîrektiyan û serdema piştî mîrektiyan. Taybetiya herî zêde girîng a serdema mîrektiyan ew e ku di vê serdemê de li gelek bajarên Kurdistanê desthilatdarî di destê mîrekên Kurdan de bû û li van bajarên jî aliyê mîrekan ve medreseyên mezin hatibûn avakirin. Helbestvanên vê serdemê bi piranî jî van medreseyan derdiketin û di bin desthilatdariya van mîrekan de dijiyan. Vê rewşê heta bi nîveka sedsala

1 Li gorî agahiyên ku Hemîd Kılıçaslan dan me, Mala Xidir li Berriya Mêrdînê axayên eşîra Miliyan bûn. Ji ber ku heft malên wan li dijî wan rabûn û di nav xwe de yekîtiyek çêkirin, Mala Xidir jî koçî herêma Amûdê kirin û li wir bi cih bûn. Piştî vê veqetînê êdî ji wan re “Milanê Xidir”, ji yên di re jî “Milanê Zorê” hat gotin. “Milanê Xidir” niha jî li dora Amûdê dijîn ku di nav sînoren Sûriyeyê de mane û ew der jî wekî Berriya Mêrdînê tê qebûlkin.

XIXem dom kir ku di vî wextî de dawî li desthilatdariya mîrekiyên Kurdan hat dayîn û di encama vê de medreseyên mîrekan jî ji holê rabûn.

Tam di vî wextî de li Kurdistanê bi riya Mewlana Xalidê Şehrezorî (k.d.1826) bizaveke tesewifî derdiket meydanê. Vê bizava ku di demeke kurt de li tevahiya cîhana Îslamê belav bûbû, bi taybetî li Kurdistanê li kêleka desthilatdariya manewî desthilatdariya siyasî û civakî jî xist destê xwe. Ev jî bi riya xelîfeyên Mewlana Xalid ên ku li cihên wekî Basret, Nehrî û Tewîleyê navendên girîng ava kiribûn çêbûbû (Ji bo agahiyên berfireh bnr. Adak 2009). Li deverên curbicur ên Kurdistanê jî şaxên van navendan vebûbûn. Îcar edebiyata Kurdî ya vê serdemê bi piranî di van navend û şaxên wan de derket meydanê û di vê serdema nû de jî helbesta Kurdî ya klasîk hebûna xwe domand. Lêbelê cudahiya helbestvanên vê serdemê ji yên mîrekiyan ew bû ku êdî helbestvan ne di bin desthilatdariya mîrekan de, bi piranî di bin desthilatdariya şêxên Xalidiyan de dijiyan û ne ji medreseyên mîrekiyan, ji medrese û tekyayên Xalidiyan derdiketin.

Helbestvanê me Şêx Muhyedîn jî yek ji wan helbestvanan e ku di vê serdema nû de di şaxeke Xalidiyan a tesewifî de perwerde bûye. Ji wê jî wêdetir ew bi xwe kurê postnişînê vî şaxî ye. Loma jî rawestana li ser aliyê Şêx Ehmedê Karazî yê tesewifî û avakirina wî ya şaxa Karaz û Hênê ya Xalidîtiyê girîng e. Şêx Ehmedê Karazî ku li cem Şêx Ebdullahê kurê Mela Yehyayê Mizûrî îcazeya medreseyê standiye, cara pêşî li cem wî întisabî tesewifê jî kiriye (Maruf, r.2). Piştî di sala 1266/1849/1850yî de ji bo ziyareta ewliyayan çûye Bexdayê û li wir jî Şêx Elî en-Neqîb destûra Qadirîtiyê standiye. Her weha li wir li cem xelîfeyê Mewlana Xalid Şêx Ebdulfettah jî perwerdeya tesewifî ditiye. Piştî li Kurdistana Başûr li cem xelîfeyê Mewlana Xalid Şêx Osmanê Tewilî perwerde ditiye. Piştî hatiye navendeke dî ya Xalidîtiyê (Basret) û întisabî postnişînê wê Şêx Xalidê Cizîrî kiriye û ji wî jî xelîfeti standiye. Lêbelê piştî mirina Şêx Xalidê Cizîrî navbera wî û postnişînê pey Şêx Xalidê Cizîrî Şêx Salihê Sîpkî xirab bûye. Lewra Şêx Salihê Sîpkî li ser xelîfeyên Şêx Xalidê Cizîrî ferz kiriye ku hemû xelîfeyên wî salê carekê werin Basretê û gora Şêx Xalidê Cizîrî ziyaret bikin. Şêx Ehmedê Karazî û gelek xelîfeyên dî ev tişt qebûl nekirine û Muhemmed el-Xanî ku li Şamê postnişînê navenda merkezî ya Xalidîtiyê bû ji mijarê agahdar kirine. Muhemmed el-Xanî di vê mijarê de Şêx Ehmedê Karazî û hevalên wî mafdar dîtine. Şêx Ehmed li cem xelîfeyê Şêx Salihê Sîpkî Şêx Hamidê Mêrdînî û kurê Mewlana Xalid Şêx Necmedîn jî perwerdeya tesewifî ditiye. Şêx Ehmedê Karazî herî dawî çûye Şamê û di sala 1844an de ji Muhemmed el-Xanî xelîfetiya mutleq standiye û vegeeriyaye Karazê (el-Xanî, r. 273-274; Korkusuz 2004, r.71-75). Bi vî awayî pêşî li Karazê û piştî jî li Hênê şaxeke girîng û naskirî ya Xalidîtiyê ava bûye ku ji aliyê Şêx Ehmed Efendî ve dihat birêvebirin.

Şêx Ehmed Efendî di jiyana xwe de xelifetî daye kesên wekî Şêx Hesênê Îshaqan, Şêx Mihemedê Hênî, Hacı Mistefayê Çermîkî, Mela Arifê Surkanî û Şêx Me'rûf (kurê wî yê mezin) û kesekî xelkê Medîneyê (Maruf, r.2).

Pey wefata Şêx Ehmed Efendî re li Hênê vê şaxa Xalidîtiyê hebûna xwe zêde nedomandiyê. Ji zarokên wî tenê Şêx Me'rûf û nivîskarê me Şêx Muhyedîn perwerdeya medreseyê dîtine. Piştî Şêx Ehmed Efendî kurê wî yê mezin Şêx Me'rûf li şûna wî postnişînî kiriye. Di maweya postnişîniya Şêx Me'rûf de nivîskarê me Şêx Muhyedîn jî li medreseyê muderristî kiriye. Piştî Şêx Me'rûf li Hênê xebatên tesewîfî bi awayekî nîzamî nehatibin domandin jî her du kurên wî Şêx Ebdullah û Şêx Qadir wekî nûnerên malbatê hatine qebûl kirin. Herweha kurê Şêx Qadir Şêx Mehmûd û kurê Şêx Mehmûd Şêx Cahid; neviyên Şêx Ehmed Efendî Şêx Riza û Şêx Emîn; kurê Şêx Muhyedîn Şêx Şewket û kurê Şêx Şewket Şêx Heybet jî nûnertiya malbatê kirine (Jêder: Şêx Cahid û Mela Ehmed).

Çawa ku li jorê jî hat gotin, di serdema piştî mîrektiyan de edebiyata Kurdî ya klasîk di bin sîwana Xalidîtiyê de pêş ketiye. Şêx Muhyedîn jî bûye yek ji nûnerên edebiyata klasîk a piştî mîrektiyan. Helbestvanê me hem di serdema bavê xwe Şêx Ehmed de, hem jî di serdema birayê xwe Şêx Me'rûf de di vê navenda tesewîfî de jiyana xwe bûrandiyê, zemanê xwe jî bo ilm û edebiyatê terxan kiriye û hemû berhemên xwe di wê atmosferê de dane.

## 5. MEXLESÊN WÎ: SA'Î Û HEQÎ

Yek ji taybetiyên girîng û jêneger ên edebiyata klasîk jî di helbest û menzûmeyan de bikaranîna mexlesê ye. Dikare bê gotin ku mexles navekî dî yê helbestvan e ku di helbestên xwe de bi kar tîne. Her çiqas pîraniya helbestvanan di helbest û menzûmeyên xwe de mexleseki tenê bi kar tînin jî, carinan hinek helbestvan jî ber sedemên curbicur du yan zêdetir mexlesan jî bi kar tînin. Helbestvanê me Şêx Muhyedîn jî yek ji wan e ku di helbestên xwe de du mexles bi kar anîne: Sa'î û Heqî. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de berî Şêx Muhyedîn, kesên wekî Melayê Cizîrî (Mela, Nişanî, Ehmed), Feqiyê Teyran (Feqî, Miksî, Mîm û Hê), Salim (Rencûrî, Bîmar û Salim) û Mewlewî (Me'dûmî û Mewlewî) jî ji yekê zêdetir mexles bi kar anîne ku Şêx Muhyedîn jî bi bikaranîna du mexlesan ketiye nav vê kategoriyê.

Her du mexlesên Şêx Muhyedîn (Sa'î û Heqî) jî di ciyên curbicur ên simatiyeya wî de derbas dibin. Mexlesa wî ya bi şeweya Sa'î di van pênc beytan de weha hatiye bikaranîn:

Xetim oldî xamûr îşî kahîde  
Çorek de yiyîlmez [se] **Sa'î** n'îde

Bes e **Sa'î** kînek heye te j' kund'ran  
Ji ber wî bi xerez hatî van kund'ran

Tu behsê qe nakî ji heywa aşî  
Bixwu roz û şeb **Sa'î** hetta xwuş î

Veşêr şorbeya şolikan bê xeber  
Heta sax î **Sa'î** meke lê nezer

Evana bi şekr û qerenfil bigîr  
Bi dimsê jî **Sa'î** were lê binêr

Mexlesa wî ya bi şeweya Heqî jî di sê ciyên menzûmeyê de bi vî awayî hatiye bikaranîn:

Bixwu subh û şaman ji wê tu Feqî  
Eger tu b' gumanî bipirs ez **Heqî**

Bi xêr hatî ey tûtîkê xurmenav  
Heme dem li we bin ji **Heqî** selav

Li finc aşî naête xwarin **Heqî**  
Li pey kardûwê tu mebe qet şeçî

Helbestvanê me derveyî simatîyeyê di helbestên xwe de jî ev her du mexlesên xwe bi kar anîne. Li gorî agahiyên li ber destan, wî mexlesa xwe ya bi şeweya Sa'î di xezelek û muxemmeseke xwe de û mexlesa xwe ya bi şeweya Heqî jî di sê xezelên xwe de bi kar anîne ku li jêrê hatine nîşandan:

Mexmûrê seher erşed **Sa'î** derê cana  
Bê mal û xerîb e ji ewan û xemzeê berqîn

Heta kengê şikayet kî evê begzadeya şêrîn  
Te nîne der cîhan yarek menendê wê dileş sengîn



Tu bispêre ‘ezîzê zuntiqam ey **Sa’iyê** xemgîn  
Li min be yek şebê firqet bi naz û ‘işwe mihman î  
Bi ser çehvê me ra hatî perîya neslê mîranî

Li van derd û xeman bigre şibak û pencer û taqan  
Derê dil **Heqîya** rade li ser wan tu bi sed xelqe

Di vê silka ku sade’n-nûr me danî lu’lu’ê mensûr  
Ku **Heqî** dil bike mesrûr ji qeyda hesretê berde

Wek tûle li dergahê te **Heqî** ku dikûze  
Hêvî me ji lutfa te ku neg’rê li me bab e

Çawa ku tê dîtin helbestvanê me Şêx Muhyedîn di sê xezelên xwe de mexlesa Heqî bi kar aniyê. Lêbelê ji ber ku ihtîmala hebûna helbestvanekî di ku mexlesa Heqî bi kar anîbe heye, li vir li ser mijara nisbeta van her sê helbestan bi bal helbestvanê me ve divê bi taybetî bê rawestan. Gelo ev her sê helbest ji aliyê helbestvanê bi mexlesa Heqî ve ku di heman demê de mexlesa Sa’î jî bi kar aniyê hatine nivîsîn, yan ji aliyê Heqiyekî di ve hatine nivîsîn? Li gorî me ji ber van xalên jêrîn, ev her sê helbestên ku bi mexlesa Heqî hatine nivîsîn jî helbestên Şêx Muhyedîn in.

1. Ji ber ku helbestvanê me di simatîyeya xwe de digel mexlesa Sa’î mexlesa Heqî jî bi kar aniyê, guman tuneke ku Heqî jî mexleseke wî ye.

2. Li gorî encamên ku di lêkolînan de ji aliyê me ve hatine bidestxistin, heta niha di edebiyata Kurdiya Kurmancî de helbestvanekî duyem ku mexlesa Heqî bi kar aniyê tuneke.

3. Di xezelek ji van xezelên ku bi mexlesa Heqî hatiye nivîsîn de, beytek heye ku nivîskar tê de bi şêweya luxezekê îşaretî mexlesa xwe ya duyem Sa’î dike. Ew beyt jî weha ye:

Ku tahir kî tu wê ‘Eynê ji dexma nuqtêya Xeynê  
Elîf deynî li mabeynê dibînî yarê bê perde

Li vir helbestvan dibêje ku eger tu herfa ‘Eyn/عê ji nuqtêya li ser Xeyn/عê paqij bikî û Elîf/ê deynî navberê, wê demê tu dê bikarî yarê rasterast bibînî. Li vir aşkeraya ku helbestvan îşaretî peyvekê dike û dibêje ‘eger tu li gorî wateya wê peyvê

tevbigerî tu dê yarê bibînî. Dema mirov lê hûr dibe, mirov têdigihe ku helbestvan herfa ‘Eyn/عَ daye û gotiye “Elif/ا”ê bixe navbera wê û herfeke dî. Her çiqas helbestvan herfa duyem nedabe jî, bi awantaj zanîna me ya derheqê mexlesa Sa’î, em têdighin ku ew herfa duyem Sîn/س e û dema herfa Elif/ا bikeve navbera Sîn/س û ‘Eyn/عê dê peyva “Sa’î/ساعى” derkeve meydanê.

Helbestvan li vir ji aliyê wateyê ve jî dibêje ku eger tu “Sa’î” bî, yanî eger tu se’yê bikî (xeyret û cehdê xerc bikî) tu dê bikarî yarê bibînî. Bi vî awayî helbestvan li vir hem îşaretî mexlesa xwe ya duyem Sa’î kiriye û hem jî şertê dîtina yarê îfade kiriye. Eger li vir ne ev yek hatibe qesdkirin, beyt dê bê wate bimîne. Loma bi rehetî dikare bê gotin ku di vê beytê de peyva Sa’î hatiye qesdkirin.

Dema mirov van xalan tevan li ber çavan bigire, bi awayekî zelal derdikeve meydanê ku ev her sê helbestên bi mexlesa Heqî jî yên Şêx Muhyedîn in û bi mexlesa wî ya duyem hatine nivîsîn.

## 6. DERRORA WÎ YA EDEBÎ

Çawa ku berî niha jî hat îfadekirin, helbestvanê me Şêx Muhyedîn tevahiya zemanê xwe ji bo ilm û edebiyatê terxan kiriye. Lêbelê nabe ku ew di karê xwe yê edebî de bi tena serê xwe mabe. Lewra di serdema piştî mîrektiyan de di dergahên Xalidiyan de gelek edîb û helbestvan hebûn û ne pêkan bû ku ev edîbên han bi hev re nekevin nav têkilî û danûstandinê.

Li gorî rîwayetê di serdema Şêx Muhyedîn de li dergahê wan ji malbata wî helbestvanekî dî jî hebûye ku navê wî Şêx Ebdullah e. Şêx Ebdullah kurê Şêx Ma’ruf, neviyê Şêx Ehmedê Efendî û kurmamê Şêx Muhyedîn e. Lê mixabin helbestên wî negihîştine roja me (Jêder: Şêx Cahid).

Di serdema Şêx Muhyedîn de li deverê dî ya Diyarbekirê (li gundê Aqtepeyê ya li ser Çinara Diyarbekirê) şaxeke dî ya Xalidiyan ava bûbû ku ev şax wekî ‘Eko-la Aqtepeyê” tê naskirin. Damezirînerê vî şaxî Şêx Hesênê Nûranî jî wekî bavê helbestvanê me Şêx Ehmedê Karazî bi dergahê Basretê yê Xalidîtiyê ve girêdayî bû. Bi vî awayî di navbera damezirînerên her du şaxan de û bi awayekî siruştî di navbera zarokên wan de jî têkiliyeke tesewifî hebû.

Aşkera ye ku Şêx Muhyedîn ji aliyê edebî ve jî bi ekola Aqtepe re di nav têkilî û danûstandinan de bû. Li gorî ku tê rîwayetkirin Şêx Hesênê Nûranî ( 1863/1864) derbareyê şiyana Şêx Muhyedîn a di helbestê de weha gotiye: “*Ez bavê şa’ira me, Sa’î jî diya wa ye.*” (Jêder: Şêx Cahid). Li gorî qeneeta me xwediyê vê gotinê jî Şêx Hesênê Nûranî zêdetir kurê wî Şêx Ebdurehmanê Aqtepe ye. Lewra Şêx Hesênê

Nûranî wekî helbestvanekî nayê zanîn, yan jî bi qasî ku tê zanîn tu helbestên wî negihîştine roja me û jî aliyê helbestê ve navdartirîn kesê Aqtepi jî Şêx Ebdurehmanê Aqtepi ye. Ji aliyekî dî ve tê zanîn ku Şêx Ebdurehman û Şêx Muhyedîn hevalê hev ê xwendinê bûne. Hetta Şêx Ebdurehmanê Aqtepi jî bo helbesta Şêx Muhyedîn a ku bi beyta

Her dema tê fikrê min Kerbela şahim şehîd  
Sed hezar lenet dibêm ber rewanê an Yezîd

dest pê dike gotiye ku ‘tenê ev beyt beramberî *Rewdu’-Neîma* min tê’ (Jêder: Mela Ehmed)<sup>2</sup> Bi rastî jî hebûna helbesên Şêx Ebdurehman ên derheqê muhebbeta ehilê beytê û le’netlêanîna Yezîd de jî ji bo hebûna têkiliyêke di navbera wan de wekî delîlekê dikare bê dîtin.

Ji Aqtepiyan kesekî dî yê ku bi Şêx Muhyedîn re di nav têkiliyê de ye Şêx Mihe-med Canê birayê Şêx Ebdurehmanê Aqtepi ye. Ji ber ku Şêx Mihemed Can zavayê Hênîyan bû, derfeta têkiliyên wan zêdetir çêdibû. Çawa ku dê li jêrê bi firehî li ser bê rawestan, hebûna helbestên her duyan ên bi temaya xwarinê vê yekê piştrast dike.

Ji bo ku têkiliya di navbera Şêx Muhyedîn û malbata Aqtepiyan de nişan bide delîleke dî jî heye ku nusxeyeke destxet a simatiyeya wî li cem malbata Aqtepiyan maye û ev nusxe digel destxetê dî yê Aqtepiyan ji bo ku îstînsax û çap bike teslîmî Zeynelabdîn Amidî hatiye kirin (Jêder: Mela Birhanê Tarînî.)

Bêguman ev hemû nişan didin ku çawa şaxên Hênê û Aqtepeyê yê Xalidî jî aliyê tesewifî ve di nav têkiliyê de ne, di heman demê de endamên wan şaxan jî aliyê edebî ve jî di nav têkilî û danûstandineke tam de ne. Guman tune ye ku kesayeta Şêx Muhyedîn a edebî di nav vê derdora edebî de kemiliye.

## 7. HELBESTÊN WÎ YÊN KLASÎK

Heta niha tenê 5 helbestên Şêx Muhyedîn hatine tesbîtîkirin. Bi vî halê xwe jî be, ev helbest dikarin bingeha dîwançeyeke biçûk saz bikin. Eger siberoj çend helbestên wî derkevin meydanê wê demê dîwançeya wî, eger gelek helbestên wî derkevin meydanê wê demê jî dîwana wî dê temam bibe.

Digel vê jî qeneeta giştî ew e ku dîwaneke wî ya helbestan hebûye, lêbelê ev dîwana wî bi awayekî yekpare negihîştîye roja me. Li gorî agahiyên ku Şêx Cahid dan me, dîwana Şêx Muhyedîn hebûye û di sala 1975an de di erdheja Liceyê de

2 Ev beyt jî aliyê Mela Ehmed ve bi awayekî zarekî ji me re hatiye gotin. Mixabin beytên dî yê helbestê nayên zanîn.

winda bûye. Bi rastî jî ji helbestên wî yên ku li ber destan e tê fêmkirin wî li gorî terzê diwanê bi qafiyeyên curbicur helbest nivîsîne û loma jî pêwîst e ku helbestên wî yên bi qafiyeyên di jî hebin (Jêder: Mela Ehmed).<sup>3</sup>

Ji van pênc helbestên wî xezela yekem di dawiya simatîyeya wî de cih girtiye.<sup>4</sup> Her sê xezelên di di mecmû'yeke destxet de cih girtine.<sup>5</sup> Muxemmesa wî jî di mecmû'eya Zeynelabidîn Amidî ya bi navê "Mecme'u'l-Qesâid"ê de cih girtiye (Amidî 1995, r.45-51). Faksîmîle û latînzeyên van her pênc helbestan ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve hatine weşandin. (Hênî 2015, r. 63-72, 94-103).

Ji ber ku em ji helbestên wî yên di ne haydar in, em dê li vê derê tenê di çarçoveya van pênc helbestan de dahûrîn û nirxandinekê bikin û cihê wî di helbestvaniya klasîk de destnîşan bikin. Ji van pênc helbestan sê heb jê bi mexlesa Heqî, du heb jî bi mexlesa Saî hatine nivîsîn. Her sê helbestên bi mexlesa Heqî bi teşeya xezelê, ji her duyên bi mexlesa Saî jî yêk bi teşeya xezelê, ya di bi teşeya muxemmesê ye.

Xezela yekem ji deh, xezela duyem ji neh, xezela sêyem ji hivde û xezela çarem ji heft beytan pêk hatine. Jimara beytên xezelan di sînoren jêrîn û jorîn de ne, lêbelê ne derveyî standarda xezelên Kurdî ne.

Xezel li gorî standardê bi şeweya aa, ba, ca... hatine serwakirin. Di xezela yekem de serwa heye, lêbelê paşserwa (redîf) tune. Di her sê xezelên di û muxemmesê de hem serwa, hem jî paşwerwa hene. Serwa, di xezela yekem û muxemmesê de murdef, di her sê xezelên di de mucerred e. Redîf, di her sê xezelan de dengê "e" ye ku lêkera "bûn"ê ya hevokên navdêrî ye û di muxemmesê de dengê "î" ye ku zemîra kesane ya şexsê duyem e.

Xezelên sêyem û çarem û muxemmes ji behra hezeca salim bi qalibê *Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*; xezelên yekem û duyem jî ji behra muzariyê bi qalibê *Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun* hatine nivîsîn. Helbestvan di bikaranîna 'erûzê de serkeftî ye. Di helbestên wî de ahengeke musîkal a serdest tê dîtin.

3 Ev beyta wî ya ku bi awayê zarekî ji aliyê malbata wî ve tê veguhestin ji bo vê yekê nîşaneyêke di ye.

Her dema tê fikrê min [ku] Kerbela şahim şehîd

Sed hezar lenet dibêjim ber rewanê an Yezîd

Bêguman ev beyt ne bi serê xwe ye, berevajiyê wê parçeyek ji helbestekê ye. Lewra di çarçoveya teknîka helbesta klasîk de ev beyt, beyta metla/destpêkê ye û pêwîst e dewama wê jî hebe. Lêbelê mixabin dewama wê li ber destan tune û di hafizeya malbatê de jî tenê ev beyt maye. Li gor rîwayetê Şêx Ebdurehmanê Aqtepi jî bo vê beytê weha gotiye: 'Ev beyt tenê beramberî *Rewdu'n-Neîma* min tê'.

4 Orjîna Simatîyeyê û ev helbesta wî di pirtûkxaneyên taybet ên Mela Zeynelabidîn Amidî de tê parastin.

5 Orjîna mecmû'eyê di pirtûkxaneya taybet a Mela Birhanê Tarînî de tê parastin.

Muxemmesa wî ji 17 bendan pêk tê ku li gorî standarda muxemmesan hinekî dirêj e. Ji ber ku di hemû bendan de her du misrayên dawî hatine dubarekirin muxemmes di nav kategoriya muxemmesên mutekerrîr de ye. Lêbelê helbestvan di vê xalê de tiştekî resen kiriye. Lewra heman neqerat di hemû bendan de bi awayekî yekpare nehatiye dubarekirin. Bi gotineke di her du beytên dawî yên benda yekem di dawîya hemû bendên di de nehatine dubarekirin. Li vir tiştê resen ev e ku her pênc misrayên benda yekem di her du misrayên dawî yên hemû bendan de bi dorê cot cot hatine dubarekirin.

Helbestên Şêx Muhyedîn çawa ku ji aliyê ruxsarê ve di çarçoveya helbestên klasîk de bin, ji aliyê naverokê ve jî di heman çarçoveyê de ne. Loma mijara sereke ya helbestên wî evîn e. Xezelên wî zêdetir “xezelên aşiqane” ne ku bi giştî derheqê kêf û izdiraba eşqê de hatine nivîsîn. Di xezelên wî de xalên wekî evîndarî û şert û mercên wê, pesindayîna xweştiviyê, mezmûnên bi xweşikayîya fizîkî ya rûyê xweştiviyê re têkildar, şibandina wê bi desthilatdarên maddî, naza wê, firqeta ji wê û eziyet û cefaya ku evîndar dikişîne cih digirin.

Her çiqas kêm helbestên Şêx Muhyedîn gihîştibin roja me jî, helbestên wî yên li ber destan ji bo ku asta helbestvaniya wî nîşanî me bidin têrê dikin. Jixwe çawa ku di mijara “Derdora Wî ya Edebî” de jî derbas bû, Şêx Muhyedîn, di helbestvaniya xwe de ji aliyê Şêx Ebdurehmanê Aqtepi ve ku nûnerekî gelekî girîng ê serdema piştî mîrektiyan e, bi gotina “Ez bavê şa’ira me, Şêx Muhyedîn jî diya wa ye.” hatiye pesendkirin. Ev pesendkirin jî pileyêke bilind a asta edebî û terzê wî yê edebî nîşan dide.

Bêguman ev nirxandina di vê anekdota tarîxî de girîng e, lêbelê dîsa jî nirxandineke bisînor e. Eger mirov di çarçoveya seyra giştî ya edebiyata Kurdî ya klasîk de li helbestên Şêx Muhyedîn binêre, dê bê dîtîna ku ew di helbestên xwe de xeta helbesta klasîk a edebiyata rojhilatê dişopîne ku di edebiyata Kurdî de bi Melayê Cizîrî simbolîze bûye. Şêx Muhyedîn terzê Melayê Cizîrî bi taybetî şopandiye û ketiye bin bandora wî. Eger dahûrînek bê kirin, dê bê dîtîna ku piraniya mezmûn û simbolên ku Şêx Muhyedîn bi kar tîne berî wî ji aliyê Melayê Cizîrî ve hatine bikaranîn. Bo nimûne mezmûn û simbolên ku di vê benda jêrîn a muxemmesa Şêx Muhyedîn de derbas dibin, ku ev bend ji aliyê temayê ve kakîla muxemmesa wî ye, di dîwana Mela de bi rehetî dikarin bînin dîtîna:

Were ey xunçeya dêr û kenîştî Ermenistan î  
 Di iqlîmê melahet de tu Cengîzîxan û Xaqan î  
 Li min be yek şebê firqet bi naz û ‘işwe mihmanî  
 Mesae’l-xeyri ya dilber li mulkê dil Suleyman î  
 Bi ser çehvê me ra hatî perîya neslê mîranî

Yek ji xezelên Şêx Muhyedîn, hem ji aliyê qafiye, hem ji aliyê weznê, hem jî ji aliyê mezmûn û sembolan ve gelekî dişibe xezeleke Melayê Cizirî ku ev xezela Şêx Muhyedîn ji bo ya Mela wekî nezîreyekê jî dikare bê dîtîn. Li jêrê ji her yekê ji wan beytek hatiye dayîn. Di van beytan de îfadeya hevbeş a bi şêweya “di husnê cewherek ferd e” digel hevbeşiyên navborî têkiliya di navbera her du helbestvanan de bi awayekî aşkera derdixe meydane:

**Melayê Cizirî:**

Ji qedd û bejn û balayê ji reng û dêm û sîmayê  
Tu rengî qet xeber nayê **di husnê cewherek ferd e**

**Şêx Muhyedîn:**

Bikin reqş û tewafê ew li dora ke'beya husnê  
Ji şewqa wê hebîba ku **di husnê cewherê ferd e**

Ev her du beytên jêrîn ên Şêx Muhyedîn û Mela jî, pileya ku bandora Mela ghiştiyê radixin ber çavan. Lewra Şêx Muhyedîn beyta Mela bi yekpareyî tezmîn kiriye û adeta heman beyt bi uslûba xwe ji nû ve nivîsiye:

**Melayê Cizirî:**

Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî  
Kesê Yûsuf firotî wî di 'alem da xesaret kir

**Şêx Muhyedîn:**

Nedî yarê bi dînarê dibî xasir di bazarê  
Kesê Yûsuf firot karî nekir kêşa kul û derd e

## 8. SIMATIYEYA WÎ

Di edebiyata klasîk de ew helbest an menzûmeyên ku derheqê pênase û zewqên xwarinan de hatine nivîsîn wekî “simatiyye/simatname” hatine binavkirin (Kaya 2007, r.48; Erdogan 2003, r.32-33) û ev helbest, menzûme û berhemên bi vê temayê yek ji cureyên edebî hatiye qebûlkin. “Simat” peyveke Erebi ye ku tê wateya sifre û xwarinên ku tên ser sifreyê. Ev peyv bi vê wateyê di simatiyeya Şêx Muhyedîn de jî sê caran hatiye bikaranîn:

Xwuş e bûqçe boregî bine **simat**  
Çûnîn te salih esehhê ruwat

Werin hûn digel kîpeê nam(i)dar  
**Simata** murovê kibarê kibar

Kereng jî bi hêkan ra tête **simat**  
 Kezalîk gûriza ku 'eynu'l-heyat

### 8. 1. Berî Şêx Muhyedîn Rewşa Simatîyeyan

Mijara xwarinê, bi awayekî giştî di edebiyata klasîk a rojhilatê de de zêde bala helbestvanan nekişandiye û di vî warî de kêr berhem hatine dayîn. Di edebiyata Farisî de ji aliyê Ebû Îshaq Hellacê Şîrazî (k.d. 1427) ve bi navê *Dîwanî Et'ime* diwaneke ku ji helbestên curbicur ên bi xwarinan re têkildar hatiye nivîsîn û berhem di sala 1302/1844-1888an de li Stenbolê hatiye çapkirin (Şîrazî 1302) Dikare bê gotin ku ev berhem hem ji aliyê qewareya xwe ve, hem jî ji aliyê dewlemendiya helbestên xwe ve di vî warî de popularîteya xwe heta niha jî didomîne. Di dawîya sedsala XVIIIem de ji aliyê Ahmed Cavid ve ferhenga peyvên wê hatiye amadekirin û peyv bi Tirkî hatine ravekirin (Gökyay 1997, r.244-245).

Vê mijarê ji edebiyata Tirkî ya klasîk zêdetir, di ya gelêrî de rexbet dîtiye û bi navê “destanên xwarinê” hatiye binavkirin. Di edebiyata Tirkî de yekem kesê ku di vî mijarê helbest nivîsîne Kaygusuz Abdal (sedsal XV-XVI) e (Kaya, h.c.; Erdoğan, h. c). Piştî wî jî gelek kesên di vî mijarê de helbestên Tirkî nivîsîne. Lêbelê di vî warî de berhemên ku hatine nivîsîn ne menzûm in, pexşan in (Kaya, h.c.; Erdoğan, h. c.; Güldemir 2010, r.3-6).

Bi qasî ku tê zanîn, di çarçoveya edebiyata Kurdî de li ser mijara xwarinê, bi gotineke di di cureya simatîyeyê de kêr nimûne hatine dayîn. Lê digel vî jî di vî warî de bi şeweyên curbicur hinek nimûne tên dîtin. Ji bo ku cihê simatîyeya Şêx Muhyedîn di nav simatîyeyên Kurdî de bi awayekî zelal derkeve meydanê, pêwîst e ku bi lêkolîneke arkeolojîk û bi awayekî giştî li ser nimûneyên vî cureyê yên di edebiyata Kurdî ya klasîk de çavek bê gerandin. Bi qasî ku tê dîtin nimûneyên beriya berhema Şêx Muhyedîn ne berhemên serbixwe ne. Dikare bê gotin ku navên hin xwarin û vexwarinan di piraniya dîwan û mesnewîyan de di nav hin beytan de cih digirin. (Ji bo teswîreke berfireh a vî mijarê bnr. Ergün 2014, r.190-192; Yıldırım 2011, r.197-199).<sup>6</sup> Lêbelê carinan jî di dîwanan de helbest (Şîrazî 1302, r. 20-21).<sup>7</sup>

6 Bo nimûne, Ehmedê Xanî, di *Mem û Zînê* de di beşa daweta Sîtî û Tacdînê de, dema sifreya mîrê Botan teswîr dike navên hin xwarin û vexwarinan dide.

7 Dîwana Ebû Îshaq Hellacê Şîrazî (sedsala XVem) ya bi navê *Dîwanî Et'ime* ku bi zimanê Farisî diwaneke bi temaya xwarinê ye wisa ye. Dikare bê gotin ku Ebû Îshaqê

û di mesnewiyan de jî beş ji bo vê mijarê hatine terxankirin (Sêrtî 2002, r.42-444; Aqtepî 1986, r.124-125).<sup>8</sup> Bêguman eger di çarçoveya dîwan û mesnewiyên klasîk ên Kurdî de xebatek li ser mijara xwarinê bê kirin, dê encamên girîng derkevin meşdanê. Lêbelê di çarçoveya agahiyên berdest de, berî Şêx Muhyedîn di vî warî de berhemên serbixwe nehatine nivîsîn.

## 8. 2. Di Serdema Şêx Muhyedîn de Rewşa Simatiyeyan û Bizava Helbestnivîsîna bi Temaya Xwarinê

Serdema Şêx Muhyedîn, ji aliyê helbestnivîsîna bi temaya xwarinê ve gelekî girîng e. Dema em têkilî û danûstandina şaxên tesewîfî yên Hênê û Aqtepeyê li ber çavan digirin, derdikeve meşdanê ku di dawiya sedsala XIXem de li van her du şaxan di çarçoveya nivîsîna helbestên bi temaya xwarinê de bizaveke edebî jî derketiye meşdanê. Lewra di encama lêkolînên me de derket meşdanê ku kurên Şêx Hesênê Nûranî Şêx Mihemed Canê Aqtepî (k.d. 1909) û Şêx Ebdurehamanê Aqtepî jî bi temaya xwarinê helbest nivîsîne. Bêguman tiştêkî gelekî balkêş e ku di heman maweyê de Şêx Muhyedîn li Hênê, Şêx Mihemed Can û Şêx Ebdurehamanê jî li Aqtepeyê di vê mijarê de helbest nivîsîne. Dema mirov têkiliyên di navbera her du şaxan de li ber çavan bigire ku me behsa wê kiribû, dê derkeve meşdanê ku ev ne tewartir, yan rasthatinek e, berevajiyê wê ev helwesta cihgirtina di heman bizava edebî de ye.

---

ku eslê xwe Kurd e di vê dîwana xwe de bi hemû teşeyên nezmê, helbestên bi xwarinê re têkildar nivîsîne. Xaleke balkêş e ku di dîwana wî de bi Kurdiya Lorî jî helbestek cih digire. Di destpêka helbestê de bi şêweya “We lehû fi’l-Kurdiyyat we’l-Lûriyat” sernavek heye. Di vê sernavê de hatiye îfadekirin ku ev helbesta wî bi zimanê Kurdî û Lorî hatiye nivîsîn. Ebû Îshaq di vê helbesta xwe de ku jî 22 beytan pêk tê bi tevahî behsa xwarinan kiriye. Ev helbesta Ebû Îshaq hem bi awayekî giştî ji bo tarîxa edebiyata Kurdî, hem jî bi taybetî di tarîxa helbestên bi temaya xwarinê de gelekî girîng e. Di serî de divê ev li ber çavan bê girtin ku helbestvanê ku di edebiyata Farişî de helbesta bi temaya xwarinê damezirandiye ku Ebû Îshaq e, kesekî Kurd e û vî kesî di heman temayê helbesteke Kurdî jî nivîsiye. Ev jî nişan dide ku helbestên bi temaya xwarinê di zimanê Kurdî de bi qasî yên Farişî kevn in. Loma bi awayekî aşkera derdikeve meşdanê ku Ebû Îshaqê Şirazî di tarîxa edebiyata Kurdî de yekemîn kes e ku bi temaya xwarinê helbest nivîsiye û di edebiyata Kurdî de nivîsîna bi vê temayê vedigere heta bi sedsala XVem.

- 8 Bo nimûne di *Nehcu’l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî de beşa bi sernavê “Mebhesu Adabi’l-Ekl”, ji bo şêwaz û adabên xwarinê hatiye terxankirin. Herweha di *Rewdu’n-Ne’îma* Şêx Evdîrehmanê Aqtepî de beşeke serbixwe ya ku bi sernavê “Der Sifetê nan û we çîzî kî be nan mîxord” (Ravekirina Nan û Tiştên ku bi nan Dixwar) ji bo xwarina Cenabê Pêxember hatiye terxankirin.



Di çarçoveya agahiyên li ber destan de, di vê mijarê de Şêx Mihemed Can li pêşiya Şêx Ebdurehman e. Lewra ji Şêx Mihemed Can helbestek, lê ji Şêx Ebdurehman tenê beytek gihîştîye me. Hem ji ber ku têkiliyeke xurt a helbesta Şêx Mihemed Can bi mijarê re heye, hem jî ji ber ku ev helbesta wî têkiliya di navbera şaxên Hênê û Aqtepeyê dupat dike, em dixwazin li jêrê cih bidin metna vê helbesta wî (Hesbî, r.111-113)<sup>9</sup>:

Ey Musulmanan bibêjim ez kelam  
Çê bitin da bo we te'sîr û eser  
Dê beyan kim lezzeta cumle te'am  
Derkevit ez qelbê we cumle keder

Ah ez destê birinca nazenîn  
Derkevit rahet mîzacê akilîn  
Goştê pez bo wê bikin ger hemnişîn  
Her ew e nav cumle xwarin mu'teber

Lê tu nakî behsê tirşa bamiya  
Têxî nav çend parçe goştê hindiya  
Laiq e ew bête sufra waliya  
Şêxê cumle tirşîka sahib huner

Ez çi bêjim wesfê qeymaxê delal  
Ger tu hunguv berdî ser wê ey heval  
'Eqlê insanan ew e tîne kemal  
Hûn bixwun hetta di çav re tete der

Sed selamê min li ser peqlawa bin  
Lê me'a'l-gullac û sûdlî pê re bin  
Mehlebî w xoşab(i) ew jî vê re bin  
Wernê ey yar û bira mednê mefer

Sed bela l' wan kutilkê tê de piyaz  
Bu wê ekla wan qe ez nadim cewaz  
Bulgura rijî meke ez kes niyaz  
Ne bixwe wan ne tu qet lê de nezer

9 Ev helbest di dawîya dîwana Şêx Hesbî a destxet de cih digire û di sala 1943yan de ji aliyê Şêx Eskerî ve hatiye îstinsaxkirin.

Bo çi qet meftûneê nakî meqal  
Bêguman sufran ew e tîne fesal  
Vê ji dest xwe bermede ey bêmecal  
Qenc e meftûne ku bulxur deynî ser

Berxekî qenc ger biheşşînî tamam  
Deynî dora wî hinek newê te'am  
Bu wê (wî) vî îdî qe naxwaze kelam  
Kî bibîne dê li ser bêtin keser

Şorbenîsk tehqîq(i) şubhê qehwe ye  
Lê digel qawurme lezzet zêde ye  
Goştê karî pîrê cumle tuxme ye  
Ez ji ekla wî bi daim ber cezer

...

Merheba ey şîşîkê 'alî meqam  
Lê digel nanê heqel ni'me't-te'am  
Deynî ser wî bexdenûs pîvazê xam  
Nadim ez ba mulkê Tacîk û Qeçer

Şorbexav û danê hêrê ser bi zêr  
Rojê xelqa rûh ji wan ez bûme têr  
Van û şorba şolika yekcar venêr  
Laiq e bo xwarina kîlab û ker

Ehlen ey qeyxaneê gozîleme  
Bo birîne birçiyar ev melhem e  
Ger hinek mastê miyan deynî cem e  
Ew dibin derman ji bo êşa ciger

Tu bi ser çavê mi ra bê ey kebab  
Goştê pez goştê mirîşka nû şebab  
Kî bixwe nabîne der heşrê 'ezab  
Xwarina wê xeyr(i) jê tê nayê şer

Mustensixê vê helbestê Şêx Eskerî li kêleka beyta "Lê tu nakî behsê tirşa bamiya / Têxî nav çend parçe goştê hindiya" de têbîniyek nivîsiye ku ev têbinî hebûna biza-veke bi vî rengî piştrast dike. Şêx Eskerî weha nivîsiye: "*Ev beyta a Şêx Ebdurehmanê*

*birayê mezinê Şêx Mihemed Can e. Quddise Sirruhuma.*” (Hesbî, h.c.)<sup>10</sup> Vê kêliyê em nizanin ka gelo Şêx Ebdurehmanê Aqtepî derheqê xwarinê de ji bilî vê beytê tiştêkî dî nivîsiye yan na. Lêbelê ev têbînî bi me dide zanîn ku li Aqtepeyê ji bilî Şêx Mihemed Can, birayê wî yê mezin Şêx Ebdurehman jî bi mijara xwarinê re têkildar bûye. Ji ber ku Şêx Ebdurehman birayê mezin ê Şêx Mihemed Can e maqûltir e ku ku wî berî Şêx Mihemed Can ev beyt nivîsibe. Herweha li gorî ku Şêx Mihemed Can beyteke birayê xwe yê mezin xistiye nav helbesta xwe, pêwîst e ku Şêx Ebdurehman ev beyta xwe berî wî nivîsibe. Loma bi rehetî dikare bê gotin ku ne ihtîmaleke dûr e ku ev beyt parçeyek ji helbesteke serbixwe ya Şêx Ebdurehman a derheqê xwarinê de be.

Mixabin ji helbesta jorîn Şêx Mihemed Canê Aqtepî tenê 13 bend gihîştine roja me. Di vî warî de mustensixê helbestê Şêx Eskerî di serê helbestê de têbîniyeke weha nivîsiye: “*Ev qewl xayet mu’teber [e]. Hem jî hewes û me’rifetêke pur tê da heyê ku apê minî Şêx Mihemed Can lawê Şêx Hesenê Nûraniyê Aqtepî gotiye. Heyf û yazux ku ne tamam e.*” (Hesbî, h.c.). Di dawiyê de ji weha nivîsiye: “*Ev tamam nebû. Hew me peyda kir, yazux.*” (Hesbî, h.c.). Di çarçoveya van têbîniyên Şêx Eskerî de dikare bê gotin ku ji aliyê qewareyê ve helbesta Şêx Mihemed Can jî di binemaya xwe de menzûmeyeke serbixwe ye, lê bele tevahiya wê negihîştîye me. Aşkera ye ku bendên wê yên kêr jî ne hindik in. Lewra mijareke wekî xwarinê ku cureyên wê nayên jimartin, hebûna gelek bendên dî dixwaze. Şêx Mihemed Can bixwe jî di benda yekem a helbestê de ev yek weha îfade kiriye: “*Dê beyan kim lezzeta cumle te’am (Ez ê lezzeta hemû xwarinan vebêjim.)*” Di her halî de ev helbesta Şêx Mihemed Can kêr jî be, dîsa ji bo tarîxa edebiyata Kurdî û îsbatkirina hizra hebûna vê bizava helbestnivîsiya bi temaya xwarinê metnekî gelekî binirx e.

Eger em muqayeseyekê di navbera her du helbestan de bikin, ji aliyê teşeya nezmê ve menzûmeya Şêx Muhyedîn bi teşeya mesnewiyê ye, lê helbesta Şêx Mihemed Can bi teşeya murebbayê ye. Ji aliyê kêşê ve menzûmeya Şêx Muhyedîn ji behra muteqaribê bi qalibê “*Fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl*”, lêbelê helbesta Şêx Mihemed Can ji behra remelê bi qalibê “*Fa’îlatun, fa’îlatun fa’îlun*” hatiye hûnandin. Her çiqas ji aliyê teşeya nezmê û kêşê ve di navbera wan de cudahiyeke hebe jî, her du jî di heman mijarê de hatine nivîsîn ku ya girîng jî ev e. Her weha dema em li hûrgiliyên mijarê, uslûb û bikaranîna peyvên jî dinêrin, têkiliya di navbera her du helbestan de zêdetir derdikeve meydanê ku li jêrê çend nimûneyên vê têkiliyê hatine pêşkêşkirin:

Di her du helbestan de jî formên “sed silav” û “merheba” hatine bikaranîn:

10 Ev helbest di dawiya dîwana Şêx Hesbî a destxet de cih digire ku di sala 1943yan de ji aliyê Şêx Eskerî ve hatiye îstinsaxkirin.

**Şêx Muhyedîn:**

Ji ber min hezar[an] selamek li wî

---

Ji min sed salam her bi roj û [bi] şeb

---

Hezar merheba mumbarê qeddiraz

**Şêx Mihemed Can:**

Sed salamê min li ser peqlawa bin

---

Merheba ey şîşikê 'alî meqam

Li gorî her du helbestvanan jî meftûne digel bulxurê tê xwarin:

**Şêx Muhyedîn:**

Çira behsê nakî ji meftûneê

Beyan ke hinek ne'tê mesnûneê

Di ber de hinde goştê xurt ê temîz

Digel bulxurê zêde xweş e lezîz

**Şêx Mihemed Can:**

Bo çî qet meftûneê nakî meqal

Bêguman sufran ew e tîne fesal

Vê ji dest xwe bermede ey bêmecal

Qenc e meftûne ku bulxur deynî ser

Li gorî her du helbestvanan jî şorbenîsk digel qeliyê xweş e:

**Şêx Muhyedîn:**

Çî reng şorbeya nîskê sahib kemal

Digel hinde qelyê xwuş e ey delal

**Şêx Mihemed Can:**

Şorbenîsk tehqîq(i) şubhê qehwe ye

Lê digel qawurme lezzet zêde ye

Li gorî her du helbestvanan jî şorbeya şolika divê neyê xwarin:

**Şêx Muhyedîn:**

Veşêr şorbeya şolikan bê xeber  
Heta sax î Şêx Muhyedîn meke lê nezer

**Şêx Mihemed Can:**

Şorbexav û danê hêrê ser bi zêr  
Rojê xelqa rûh ji wan ez bûme têr  
Van û şorba şolika yekcar venêr  
Laîq e bo xwarina kîlab û ker

Her du helbestvanan jî xîtabeke xweş li şîraniyan kirine û bi taybetî ifadeya “sûdlî yû mehlebî” bi heman şeweyê bi kar anîne:

**Şêx Muhyedîn:**

Hezar merheba sûdlî yû mehlebî  
Şeb û roj selamê di min li we bî

**Şêx Mihemed Can:**

Sed selamê min li ser peqlawa bin  
Lê me’al-gullac û sûdlî pê re bin  
Mehlebî w xoşab(i) ew jî vê re bin  
Wernê ey yar û bira mednê mefer

Her çiqas ne bi heman perspektîfê jî be, her du helbestvanan jî behsa xwarina bamiyan kirine ku ev xal derheqê têkiliya di navbera her du helbestvanan de fikreke bihêz dide mirov:

**Şêx Muhyedîn:**

Îlahî meke qismetê min tu car  
Evan bamiyê mirarê mirar

Welêkîn çikim Şeyx(i) Nûrî divê  
Newêrim bibêjim qeda lê kevê

**Şêx Mihemed Can:**

Lê tu nakî behsê tirşa bamiya  
Têxî nav çend parçe goştê hindiya

Laîq e ew bête sufra waliya  
Şêx cumle tirşika sahib huner

Çawa ku tê dîtîn, ji her du beytên Şêx Muhyedîn tê fêmkirin ku ew bixwe qet ji bamiyan hes nake, lêbelê kesekî dî yê bi navê Şêx Nûrî ji bamiyan gelekî hes dike û ev di wê astê de ye ku Şêx Muhyedîn ji wî kesî newêre dev bavêje bamiyan. Ji beyta Şêx Mihemed Can jî tê fêmkirin ku ew ji bamiyan gelekî hes dike. Çawa ku li jorê hat gotin ku li gorî îfadeya Şêx Eskerî ev beyta Şêx Mihemed Can di binemaya xwe de ya Şêx Ebdurehmanê Aqteqî bû. Bi qeneeta me dibe ku ev beyt berî Şêx Ebdurehman jî aliye bavê wî Şêx Hesênê Nûranî ve hatibe gotin. Bi rastî jî tişteki ne dûr e ku Şêx Ebdurehman beyteke bavê xwe bi kar anibe. Eger em vê beytê ya Şêx Hesênê Nûranî qebûl bikin, wê demê dê derkeve holê ku mebesta Şêx Muhyedîn bi Şêx Nûrî Şêx Hesênê Nûranî ye. Bi rastî jî ji ber pêdiviyên wezna ‘erûzê ne dûr e ku di helbestê de bi şeweya “Şêx Nûrî” behsa Şêx Hesênê Nûranî hatibe kirin.

Di encamê de tê dîtîn ku li Aqtepeyê Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can û li Hênê jî Şêx Muhyedîn sê helbestvan in ku bi temaya xwarinê helbest nivîsîne û bi vî awayî di tarîxa edebiyata Kurdî de bûne nûnerê bizaveke nû. Divê neyê jibîrkirin ku di vê derdorê de derketina nimûne û helbestvanên nû yên bi xwarinê re têkildar her dem pêkan e.

Li vir ji bo ku mijar baştir zelal bibe divê li ser bersiva pirsra “Gelo sedem û faktorên ku di derketina vê bizavê de diyarker in çi ne?” hinekî bê rawestan. Bêguman her bizavek bivênevê bi rewşa serdema xwe ve girêdayî derdikeve meydanê. Dema em bi vî çavî li serdema Şêx Muhyedîn û Şêx Mihemed Can dinêrin, em dibînin ku di sahaya Osmaniyan de berhemên derheqê xwarinê de cara pêşî di heman serdemê de li Stenbolê hatine çapkirin. Ji van berheman du heb jê gelekî girîng in: *Melceü’t-Tabbâhîna* Mehmet Kâmil û *Dîwanî Et’imeya* Ebû Îshaq Hellacê Şîrazî. *Melceü’t-Tabbâhîn* yekem berhem e ku di serdema Osmaniyan de derheqê xwarinê de hatiye nivîsîn û di navbera salên 1844-1888an de neh caran hatiye çapkirin (Güldemir 2010, r.8). *Dîwanî Et’ime* jî di sala 1302/1884/1885an de hatiye çapkirin.

Aşkera ye ku van her du pirtûkan di serdema xwe de sansasyoneke mezin çê kirine ku ji çapên zêde yên *Melceü’t-Tabbâhînê* ev yek baş tê fêmkirin. Bêguman ne pêkan e ku du rewşenbîrên weki Şêx Muhyedîn û Şêx Mihemed Can ku bi edebiyat û çandê re têkildar in ji van berheman ne haydar bin û ew nexwendibin. Loma li gorî qeneeta me bi rehetî dikare bê gotin ku ev her du helbestvan di bin bandora vê bizava rojane ya serdema xwe de mane û wan jî ev terz di Kurdî de bi cih kirine.

Ji bilî vê em dibînin ku di serdema piştî bizava helbestnivîsiya bi temaya xwarinê de jî ku beramberi sedsala XXem tê, di edebiyata Kurdî ya klasîk de nûnerên

helbestnivîsîna bi temaya xwarinê derketine meydanê. Bo nimûne Mela Ehmedê Nalbend (k. d. 1963), Mela Ehmedê Zinarexî û Abdulkadir Bingöl di helbestên xwe de li ser cureyên ciyawaz ên xwarinan rawestiyane. Seyîd Eliyê Findikî (k. d. 1968) û Dilbirînê Botî jî helbestên xwe ji bo cureyek tenê terxan kirine (Nalbend 1998, r.512-513, 521-522; Findikî 2011, r.291; Bingöl 2007, r.85-87; Botî 2007, r.89). Bêguman eger lêkolîn bên kirin, çî di edebiyata gelêrî de be, çî di ya klasîk de be, dê nimûneyên mijara xwarinê bi şêweyên curbicur bên dîtî û ji niha şûn de derketina gelek nimûneyên di guncaw e. Lêbelê di çarçoveya van nimûneyan tenê de jî be dikare bê gotin ku di vê serdemê de li gorî serdemên berî xwe jimara helbestên rasterast bi temaya xwarinê re têkildar zêde bûye û di vî warî de bi şêweyên curbicur helbest hatine nivîsîn.

Dema mirov li van helbestan dinêre tê dîtî ku yan derheqê cureyekî tenê de ne, yan jî jimara xwarinên ku behsa wan tê kirin ne di pileyê gelekî bilind de ne. Loma jî yek ji van helbestan jî aliyê qewareyê ve nagihîje simatîyeya Şêx Muhyedîn a derheqê xwarinê de ku tê de ji 130î zêdetir xwarin cih digirin. Ev jî dide nîşandan ku Şêx Muhyedîn di vî warî de bê hemta ye û heta niha kesek jî wî derbas nebûye.

Dikare bê gotin ku jî aliyê mijar û naverokê ve di edebiyata Kurdî ya klasîk de mijarên bi evîn, dîn û tesewifê ve girêdayî mijarên herî zêde zal û serdest in. Eger mijarên evînî jî wekî parçeyek ji tesewifê bên qebûlîkirin ku di encamê de termînolojîya evînê jî wateyê tesewifî bi dest dixê, wê demê ev jimar dê dakeve duduyan. Loma her çiqas di mijarên ladînî/beşerî yên wekî ferheng û tarîxê de hinek berhem hatine dayîn jî, rêjeya wê li gorî yên dînî û tesewifî gelekî kêmtir e. Di rewşeke weha de Şêx Muhyedîn ne di çarçoveya serdema piştî mîrektîyan tenê de, di çarçoveya serdema mîrektîyan de jî ji girîngtirîn nûnerên edebiyata Kurdî ya ladînî/beşerî divê bê hesabandin.

Bêguman dema paşxana Şêx Muhyedîn ya medrese û tekyayê li ber çavan bê girtin ku ew bixwe kurê damezirînerêkî şaxeke tesewifî ye, nivîsîna wî ya di mijareke beşerî de zêdetir balê dikişîne ser xwe. Lêbelê divê neyê jibîrîkirin ku di mijarên ladînî de jî be, di serdema klasîk de cihê derketina berhemên edebî dîsa medrese û tekyayên tesewifî bûn. Lewra ew der di heman demê de cihên huner, edebiyat, siyasat û rewşenbîriya serdema xwe bûn.

Berhema Şêx Muhyedîn, ne di çarçoveya edebiyata Kurdî ya klasîk tenê de, di warê çanda Kurdan a xwarinê de jî di erkê berhema yekem de ye. Çawa ku jî aliyê Cemşîd Bender ve jî hatiye gotin, herçiqas heta niha berhema wî ya bi navê *Kürt Mutfak Kültürü ve Kürt Yemekleri* (Bender 2003) wekî berhema yekem a ku derheqê xwarinên Kurdan de hatiye weşandin tê qebûlîkirin jî, bi awayekî giştî berhema yekem a ku di sahaya xwarinên Kurdan de hatiye nivîsîn menzûmeya Şêx Muhyedîn e.

Lewra di navbera nivîsîna her du berhemana de nêzî sed salî ferq heye. Ev jî girîngiya berhema Şêx Muhyedîn zêdetir dike.

### 8. 3. Simatiyeya Şêx Muhyedîn

Vê keliyê tenê nusxeyeke destxet a simatiyeya Şêx Muhyedîn li ber destan heye. Ev nusxe ne ya nivîskarê berhemê Şêx Muhyedîn e. Nusxeya ku beşek ji keşkûlekê ye, di nav pirtûkên malbata Aqtepiyan de hatiye parastin. Loma bi ihtimaleke mezin ev nusxe ji aliyê endamê malbata Aqtepiyan ve hatiye istinsaxkirin. Li gorî qeneetê ev kes dê Şêx Evdirrehmanê Aqtepi, yan jî Şêx Mihemed Canê Aqtepi be. Loma ev nusxe wekî nusxeya Aqtepeyê dikare bê binavkirin. Orjînalê wê nusxeyê niha di pirtûkxaneyê taybet a Mela Zeynelabidîn Amidî de tê parastin (Hênî 2015, r16-17). Simatiyeya Şêx Muhyedîn li ber wê nusxeyê du caran jî hatiye çapkirin. Cara yekem ji aliyê Zeynelabidîn Amidî ve di dawîya Dîwana Şêx Ebdurehmanê Aqtepi de bi alfabeya Erebi (Weş. Diyarbakır Söz, Diyarbakır 1997; cara duyem jî ji aliye Mela Birhanê Tarîni ve bi alfabeya latîni hatiye çapkirin (Weş. Peywend, Stenbol 2015).

Taybetiyên ruxsarî yê simatiyeya Şêx Muhyedîn weha dikarin bîn rêzkirin: Menzûme li ser esasê beytan û bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Di menzûmeyê de bi giştî 186 beyt cih digirin. Hemû beytên wê di nav xwe de hemserwa ne. Şemaya serwaya wê bi şeweya aa, bb, cc... ye. Menzûme bi kêşa erûzê ji behra muteqaribê li ser qalibê “fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl” hatiye nivîsîn.

Simatiyeya Şêx Muhyedîn, bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsîn. Wekî ku di hemû berhemên edebiyata klasîk de diyardeyê jêneger e, metnê wê menzûmeyê jî para xwe ji bandora zimanên serdest girtiye. Di wê berhemê de li gorî giraniyê bi rêzê bandora sê zimanan çê bûye: Tirkî, Erebi û Farsi.

Di berhemê de zimanê Tirkî bi awayekî berbiçav ji aliyê nivîskar ve hatiye bikaranîn. Zimanê Tirkî bi giştî bi du şeweyan rengê xwe daye berhemê. Hebûna beytên Tirkî û bikaranîna navên Tirkî jî bo xwarinan. Di berhemê de neh beyt bi tevahî bi Tirkî hatine nivîsîn. Bêguman di nav 186 beytan de rêjeya neh beytan hindik e, lêbelê li cihê ku ne bi Erebi û ne bi Farsi yek beyt tenê jî nehatibe nivîsîn, hebûna neh beytên Tirkî di xwe de wateyekê dihewîne ku li jêrê dê li ser bê rawestan. Li jêrê wekî nimûne ji berhemê çend beytên Tirkî cih digirin:

Sûboregî ikî qisimdir birî  
Penirle we qîme île digeri

Yemek qitlixinden bizirkan aşî  
Yenir pilaw île bilin bu işî



Nişa helwasî de yiyîlûr îmiş  
Welê sewmiyem ben ecaîb bîr îş

Dîsa di menzûmeyê de navên 25 xwarinan bi Tirkî ne. Dema 133 xwarinên ku di menzûmeyê de derbas dibin li ber çavan bîn girtin, dê bê dîtîna ku ev rêje ne hindik e. Lewra ev jimar teqrîbî beramberî pêncyeka tevahiya xwarinanên di berhemê de tê ku ev jî rêjeyeke bilind e. Yanî di berhemê de bandoreke mezin a Tirkî li ser zimanê Şêx Muhyedîn heye. Li gorî qeneeta me ev bandor di çarçoveya sê sedeman de dikare bê ravekirin:

1. Şêx Muhyedîn helbestvanê Kurdîstana Osmanîyan e. Bi awayekî siruştî li ser Kurdên Osmanî rengê Tirkî xwe nîşan dide.

2. Şêx Muhyedîn piştî mîrektiyan di dawiya sedsala XIXem de jiyaye. Di wê serdemê de di çarçoveya politikaya Îttîhad û Tereqqiyê de li Kurdistanê gelek xwendîngên ku bi Tirkî perwerde didan vebûne. Loma jî helbestvanên piştî mîrektiyan li gorî yên serdema mîrektiyan zêdetir di bin bandora Tirkî de mane ku Şêx Muhyedîn jî yek ji wan e.

3. Şêx Muhyedîn xelkê Hênê ye û Hênê jî li ser Diyarbekirê ye. Di serdema Osmanîyan de bajarên wekî Diyarbekir û Hênê ku ne di bin desthilatdariya mîrektiyanê Kurdan de bûn, ketibûn bin bandora zimanê tirkî. Bi taybetî bajarê Diyarbekirê di serdemên Artukî, Akkoyunî û Osmanîyan de demeke dirêj di bin desthilatdariya tirkî de maye. Loma jî çî di warê xwarinê de, çî di warên dî de, li wê derê bi awayekî siruştî ziman û kultura Tirkî bûye serdest. Ne pêkan e ku helbestvan û rewşenbîrekî wekî Şêx Muhyedîn ji vê kultura serdest a Osmanîyan bêpar mabe. Ji xwe ji van beytên jêrîn ên Şêx Muhyedîn tê fêmkirin ku Hênê be, yan Diyarbekir be ferq nake, ew li bajarêkî jiyaye û loma jî behsa xwarinên bajarî dike:

Ew e xwarina paşan, mîr û tamam  
**Di bajêr de** meşhûrê ehlê kîram

Çunîn kuvte **muxtarê çarşû** bizan  
Eger we nebe ez bibêjim 'eyan

**Di bajêr de** meşhûrê xas û 'ewam  
Ji ber wê ye cumle merîd in dewam

Di berhemê de bandora Erebi ne di asta bandora Tirkî de ye. Erebi tenê di çarçoveya bikaranîna hin peyvên de rengê xwe daye berhemê. Ev jî ji bo serdema klasîk

tiştêkî siruştî ye û wê demê piraniya wan peyvên ji aliyê xwendevanên berhemê ve dihatin fêmkirin. Ji van peyvên çend hebên ku ji nîfşên îroyîn re biyanî ne ev in (li gorî rêza alfabeyê): “Akil, bê xefa, bab, bedî, be’id, besel, besel, bi’-delîl, bîla şubhe, cinsî’l-lehm, cunûn, cuses sexîr, eriz, et’ime, ‘edîd, ‘eynê heram, festemî, kesîr, lewiz, lezaiz, merîd, meşwî, seqîl, simat, şahu’t-te’am, tecerub ke, wa hesreta, we îlla, zuxel.” Li jêrê wekî nimûne du beytên ku hin peyvên Erebi di wan der derbas dibin cih digirin:

Fesûlî be tîzetî tîte **ekil**  
 Heye wî [di] **babê lezaiz fedil**

Tu sukre kebabî qe nakî **‘edîd**  
 Ji **new’ê lezaiz** me kir wê **be’id**

Li ser zimanê berhemê herî kêr bandora Farisî heye. Lewra di berhemê de rengê Farisî ji bikaranîna çend peyv û formên Farisî ne wêdetir e. Wekî “în mekan (ev mekan), çunîn (weha), nameş (navê wî), bedekil (bêçêj), merdum (zilam), qeddiraz (bejndirêj) û namê dîger (navê dî).” Çawa ku tê dîtin hem jimara peyv û formên Farisî kêr e, hem jî ji ber ku piraniya wan di Kurdiya Kurmancî, yan jî Zazakî de bi awayekî tîn bikaranîn, îro jî bi rehetî dikarin bîn fêmkirin.

### 8. 3. 1. Şêwaza Vegotinê

Ji ber ku berhem derheqê mijareke taybet de hatiye nivîsîn, di vegotinê de jî şêwazeke taybet hatiye bikaranîn. Şêwazên edebî yê ku di berhemê de cih digirin curbicur in û ji taybetiyên mijarê neşet dikin. Xalên sereke yê ku di şêwaza vegotina berhemê de balê dikişînin zimanekî bicoş, mîzah, tekrîr, hizra sabit, nifir û heqaret, teşbihên giran, zimanê bêperde û teşxîs e ku li jêrê dê li ser van şêwazan bê rawestan.

Nivîskar dema behsa çêj û lezzeta hin xwarinan kiriye şêwazeke bicoş bi kar anîye. Ev coş bi peyv û îfadeyên wekî “selamun ‘eleykum”, “hezar[an] selam”, “Ji min sed selam her bi roj û [bi] şeb”, “heme dem li we bin selav”, “‘eleykum selam”, “hezar merheba”, “bi ser çêhvê min ra hatî merheba” “bi xêr hatî”, “were zû”, hatiye ziman. Xuya ye ku çêj û lezzeta wan xwarinan li cem nivîskar di asta herî bilind de ye:

Hezar merheba tirşîya lehanan  
 Were zû bizan sufre hate meyan

Bi xêr hatî ey tûtîkê xurmenav  
Heme dem li we bin ji Heqî selav

Mîzah şêwazeke sereke ye ku di vegotina simatîyeyan de sûd jê tê wergirtin. Nivîskarê me jî di simatîyeya xwe de carinan serî li şêwaza mîzahê daye. Bêguman dema ku mijar mijareke wekî xwarinê be ku aliyê wê yê kêfê jî heye, ne pêkan e ku serî li şêwaza mîzahê neyê dayîn. Di van beytên jêrîn de ev rêbaz tê dîtin:

Eger nakî bawer ku patîle xweş  
Bipirse ji şiblî efendiyê leş  
---  
Îlahî meke qismetê min tu car  
Evan bamiyêê mirarê mirar  
---  
Helawa ji arvanê bulxûr îmam  
Ji min dûr bê hetta bi Roja Qiyam

Nivîskar, di berhemê de bi giştî girîngî daye aheng û melodiyê. Di vê çarçoveyê de di hinek beytan de serî li hunera tekrîrê jî daye. Di tekrîrê de bi mebesta balkişandinê peyvek yan îfadeyek tê dubarekirin. Di van beytên jêrîn de ev huner dikare bê dîtin:

Bi bîber û buxdenûs û ey 'ezîz  
Di nêva te'aman lezîz e lezîz  
  
Hesenkêv jî pak e welêkîn neçar  
Wuha reng sûborek kibarê kibar  
...  
Hevîr e hevîr e hevîr e hevîr  
Tu guh dêre vê bendê min ey emîr

Nivîskar di hin mijaran de xwediyê hizreke sabit e. Ji xwarinan bi taybetî derheqê rexneya kundiran de hizra wî ya sabit di asteke gelekî dijwar de ye. Tenê di cihêkî de 10 beyt ji bo rexneya kundiran terxan kiriye. Emê jê çar beytan pêşkêş bikin:

Qebaqden niçûn soylemez kelam  
Peyxember yemaxî 'eleyhi's-salam

Bizan ev rîwayet betal e Hemed  
Ne rawî ne naqil tunîne sened  
...  
We îlla nema şey'ekî el-eman  
Nebî jî bixwu ji [ewan] kundiran  
...  
Bes e Sa'î kînek heye te j' kund'ran  
Ji ber wî bi xerez hatî van kund'ran

Nivîskar carinan dema ku ji xwarinekê hes nekiriye serî li uslûba nifir û heqaretê jî daye. Wekî;

Îlahî helîne ji beyna 'îbad  
Bibe kor bi kor ê ku anî îcad  
---  
Tu behsê qe nakî ji qatqatê qenc  
Qeda lê keve 'eynê emrad û renc  
  
Xusûsa ku dimsê lêkin el-eman  
Dibe xwarina kûçikan bê guman  
---  
Li min bû bela tîrşîya kundiran  
Te navêm here tu tewîla keran

Nivîskar carinan serî li teşbihên giran daye û xwarinên ku ji wan hes nekiriye, bi tiştên kirêt şibandine:

Ji ku derketî ey şî'ra şepal  
Wekî kurmê piştî keran ey heval  
---  
Rîçala ji balcan bi dimsa xebîs  
Wekî şorbeya têkevê mişkê pîs  
---  
We kuvtê ji kuncî qeda lê keve  
Wekî rêxa taze ku kurm têkeve

Nivîskar, di derbirîna hizra xwe ya neyînî ya derheqê hin xwarinan de ji mîzahê jî wêdetir serî li rêbaza zimanê bêperde daye. Bo nimûne:

Qeda bê li dolmê pîvaza gelek  
Wekî hêlikê kûçikan e felek

Nivîskar, bi riya silavdayîna li ser xwarinên ku ji wan hes kiriye an nekiriye serî li hunera teşxîsê daye. Divê bê gotin ku di van ciyan de şêwaza zimanekî bicoş jî bikaraniye. Bo nimûne:

Hezar merheba tirşiya lehanan  
Were zû bizan sufre hate meyan  
---  
Bi xêr hatî ey tûtîkê xurmenav  
Heme dem li we bin ji Heqî selav  
...  
Di rojek ewan kundirê bedekil  
Li halê xwu giryan me nîne fedil

### 8. 3. 2. Avahî û Tertîb

Simatîyeya Şêx Muhyedîn, ji aliyê avahî û tertîbê ve ji du beşan pêk tê: Beşa destpêkê û beşa mijara sereke. Di dawiya menzûmeyê de ber'êksê kevneşopiyê, beşa xatîmeyê cih negirtiye ku ev jî ji aliyê avahiya menzûmeyê ve wekî kêmasiyekê dikare bê ditin.

Beşa destpêkê ji sê beytên pêşî yê menzûmeyê pêk tê. Di beyta yekem de nivîskar mexlesa xwe aniyê ziman û xwe wekî xwediyê mîzaceke xerîb daye naskirin:

Feke Sa'iyê zû mîzaca xerîb  
Herçî new'ê [xwarinê ye] pur 'ecîb

Bêguman ew mîzaca wî ya xerîb e ku berê wî daye mijareke wekî xwarinê ku di wê serdemê de nivîsîna di vî warî de tiştêkî nadir e û lewra jî xerîb e.

Nivîskar di her du beytên peyrew de jî mijara menzûmeyê ya xwe û rêbaza xwe ya di vegotinê de aniyê zimên:

Bi cins û bi new' û bi fêslê ewan  
Bi çî têtê xwarin bikêşne beyan

Heçî ku lezîz in û xeyrî lezîz  
Beyan ke û îlhamê bigre temîz

Di van beytan de nivîskar rêbaza xwe ya ku di menzûmeyê de dê bişopîne di sê xalan de aşkera kiriye: 1. Cins, new' û fêslên xwarinê, 2. Tiştên ku bi xwarinan re tîn xwarin, 3. Lezzet û tama wan. Bêguman di destpêka berhemê de diyarkirina rêbazê ji aliyê zanistî ve xaleke erênî û girîng e.

Nivîskar piştî beşa destpêkê dest bi beşa mijara sereke kiriye û heta bi dawiya menzûmeyê ev mijar domandiye. Ev beş ji 183 beytan pêk tê.

### 8. 3. 3. Naverok

Mijara simatiyeya Şêx Muhyedînê Hênî, bi awayekî giştî danasîna kom û cureyên xwarinan e. Nivîskar di berhemê de cih daye nav û taybetiyên gelek xwarinan û derheqê gelean ji wan de nêrînên xwe yên erênî û nerênî îfade kirine.

Emê ji di çarçoveya rêbaza ku di destpêkê de ji aliyê nivîskar bixwe ve hatiye diyarkirin çend tiştan bibêjin. Bi vî awayî hem rêbaza wî ya ku şopandiye baştir dê bê fêmkirin, hem dê asta serkeftina wî ya di vê rêbazê de bê pîvan, hem jî naveroka berhemê dê li ber çavan bê raxistin. Li jêrê dê 'cins, new' û fêslên xwarinê' bi sernavê 'senifandina xwarinan', 'tiştên ku bi xwarinan re tîn xwarin' bi sernavê 'formulasyonên xwarinan' û 'lezzet û tama wan' jî bi sernavê 'çêja xwarinan' bîn îfadekirin.

Bi îfadeyên nivîskar wî berhema xwe li gorî cins, new' û fêslên xwarinan amade kiriye ku ev jî rêbaza wî ya di senifandina mijarê de îfade dike. Nivîskar ji peyva "fêsl"ê bi awayekî sistematîk dabeşkirina berhemê bi bal beşan ve, ji peyva "cins"ê komên xwarinan (wekî koma şorbeyan û hwd.) û ji peyva "new"ê jî cureyên xwarinên ku dikevin bin van koman de (wekî şorbeya nîskê û şorbeya şolikan û hwd.) qesd kiriye.

Bi rastî jî nivîskar ev rêbaz çawa ku gotiye şopandiye. Wî di dabeşkirina mijarê de bi awayekî giştî li gorî sistemekê hereket kiriye, ne bi awayekî tevlihev û belawela mijar pêşkêş kiriye. Lêbelê eger wekî kêmasiyekê bê dîtîn, wî carinan hinek xwarin ne di beşa xwe de bi cih kirine. Wisa xuya ye ku nivîskar carinan piştî ku beş xilas kiriye, navên hin xwarinan hatiye bîra wî û navê wan xwarinan li wir zêde kiriye û piştî jî cihê wê neguherandiye. Bo nimûne ev rewş di van her du beytên jêrîn de baş tê dîtîn. Lewra li pey derbirîna kutabûna beşa xamûran ji nû ve behsa cureyêke dî ya xamûran hatiye kirin ku ew jî şamboregî ye:

Xetim oldî xamûr îşî kahîde  
Çorek de yiyîlmez [se] Sa'î n'ide

Înan ke ku şamboregî jî nevîs  
Di bezma ku ew tê de bin kin celîs

Di berhemê de fêsl/beşên ku sînorên wan aşkera ne şeş heb in: Beşa xamûran, beşa zerzewatan, beşa goşt, beşa pincaran, beşa rîçalan û beşa tirşiyên. Nivîskar bi rêzê cih daye van beşan û wekî rêbaz ji bo wan sernav bi kar neanîne, lêbelê di destpêka wan de bi beyteke destpêkê koma xwarinê ya ku di wê beşê de dê behsa wê bê kirin daye nasandin. Dikare bê gotin ku ev beyt erka sernavan tînin cih. Ji bo ku ev rêbaza wî jî bê dîtîn, li jêrê em cih didin van şeş beytên destpêkê:

**Beşa Xamûran:**

Herçî cinsê xamûr îşî ke beyan  
Ji rê ve li ser min nebit da nihan

**Beşa Zerzewatan:**

Safa geldiniz zerzewatlar beta  
Sizin akiliz çekmeye hiç cefa

**Beşa Goşt:**

Were mebhesa goştê şahu't-te'am  
Heçî sufreya bê wê 'eynê heram

**Beşa Pincaran:**

Ji pincar xweş e serbimastikeya  
Qeda bê li pirparê ey dilruba

**Beşa Rîçalan:**

Rîçala ji uşnan [e] şahu'r-rîçal  
Rîçala sêvan jî xwuş e bê mecal

**Beşa Tirşiyên:**

Selamun 'eleykum eya tirşiya  
Ji îsot kerem ke tu vê sêniya

Çawa ku li jorê jî hat gotin, komên xwarinê yên ku di berhemê de cih girtine ne ev tenê ne. Dema mirov ji vî aliyê ve li naveroka berhemê dinêre tê dîtîn ku di

berhemê de behsa gelek komên dî jî hatiye kirin. Her çiqas senifandinên cihê jî pêkan bin, em dê xwarinên ku di berhemê de cih digirin li ser 20 koman dabeş bikin ku ew jî ev in: Nan, şorbe, borek, dolme, pincar û giya, zerzewat, goşt, kebab, kuvte, seqetat, dan, savar, xoşav, şêranî, helaw, rîçal, tîrşî, fêkî, pêxwarin û vexwarin. Li jêrê lîsteya van koman û cureyên xwarinan ên ku dikevin bin wan cih digire:

### 1. Koma Nan

Nanê genim/nanê buxde

Taş ekmeğî

Ekmek balixî

Hevrîşika Nanê Germ

### 2. Koma Şorbeyan

Şorbeya Nîskê

Şorbeya Şolikan

Qulaq Şorbesî

Mixil Torbesî

Ezme Şorbesî

Şî'îr

### 3. Koma Borekan

Patîle

Boreka Hesenkêfê

Sûboregî

Penîr borekî

Bûqçe boregî

Mafiş

Zerabet (Zerfet)

Qatqat

Zengil

Bûşkelen

Yûxeê irtebê

Borek

Fincan Boregî

Şamboregî

### 4. Koma Dolmeyan

Dolmê balîcanan

Dolmê xiyar

Dolmê pîvaza

Sarme

### 5. Koma Pincar û Giyayan

Serbimastik

Pirpar

Kereng

Gûriz

Sîrim

Yonca

Pincara sipî

Sarmeya pincara sipî

### 6. Koma Zerzewatan

Bîlî baxleya

Musaqa

Guweç

Çertme

Beqle

Fesûlî

Kundir

Bamiye

Heywa aşî

Meftûna kengerê îspenaq

Boranî

Mesaq

Fincaşî

Kardû

Mûsilaşî



## 7. Koma Goşt

Qelî

Qelisêl

Pasdirmê

Qîma meşwî

Tawûq gogsî

## 8. Koma Kebaban

Tebeq Kebabî

Lûle kebabî

Sukre kebabî

Qaşîq kebabî

Tencere kebabî

Musaqe

## 9. Koma Kuvteyan

Kuvteê navtîjî

Kuvtê ji kuncî

Dawûdpaşa Kuvtesî

Kuvteê tîrş

Xatûnbûdî

## 10. Koma Seqetatan

Kellepaç

Mumbar

Kîpe

Kîbeê turunc

Kîbe qudûr

Eşkêna goşt

Helîsa ji goşt

Zerşîk

Yexnî

Qapulme (Qapilme)

## 11. Koma Xwarinên ji Dan

Keşke

Mehîr

Mastewa

## 12. Koma Xwarinên ji Savarê

Savar

Gebol (çavbelek)

## 13. Koma Xoşavan

Alma sawuqlîxî

Helawa erûnga

Xwoşaba erûnga

Xwoşaba ji încazê

Xwoşaba hêjîran

## 14. Koma Şêraniyan

### a) Şêraniyên Xamûran

Peqlewa

Qalib

Sarox burmesî

Penîr peqlewasi

Qedaîf

Tûtîkê xurmenav

Gulac

### b) Şêraniyanên Şîr

Sûdlî

Mehlebî

Qeraş

Almastî

### c) Şêraniyanên Dimsê

Esîda sipî ya bi dimis

‘Eqîda şikeftan

Serbidims

Vizik Çizik

### d) Meşlûl

Meşlûlê hêjîran

## 15. Koma Helawan

Helawa ji hingiv

Helawa penîr

Nîşa helwasi

Esîd

Helawa ji arvan

**16. Koma Rîçalan**

Rîçala uşnan

Rîçala sêvan

Rîçala şufteliyan

Rîçala buyokan

Rîçala qarpûz

Rîçala qawûnan

Rîçala balcanan

**17. Koma Tirşiyân**

Îsot

Tirşiya Lehanan

Tirşiya Kundiran

Tirşiya Balîcan

**18. Koma Fêkiyan**

Zebeşê çem

**19. Koma Pêxwarinan**

Toraq

Zeytûn

Penîrê Qerecdaxê

Mîxli me'dem

Hêk

Dims

**20. Koma Vexwarinan**

Dewê sar

**Navên Hin Alavên Xwarinê**

Balîcan

Bîber

Birinca Qerecdaxê

Edes tuxmî

Hêk

Hingiv

Qerenfil

Qîme

Pûng

Rûn

Şekir

Tirpê sipî

Rêbaza duyem a ku nivîskar di vegotina xwarinan de şopandiye, behskirina wan tiştan e ku bi hev re tên xwarin. Nivîskar ev rêbaza xwe weha ifade kiriye: “Bi çi têtê xwarin bikêşne beyan”. Ev yek ji aliyê me ve dê wekî “formulasyona xwarinan” bê îfadekirin. Nivîskar di berhemê de li ser bersiva pîrsa “çi bi çi têtê xwarin” rawestiyaye û bi vî awayî zewqa xwe ya xwarinê aniye ziman. Dema mirov di tevahiya berhemê bi baldarî li van formulasyonan dinêre derdikeve meydanê ku nivîskar ev xal kiriye du beş: Formulasyonên di çêkirin û amadekirina xwarinê de û yên di menûya ser sifreyê de.

Nivîskar di van formulasyonên jêrîn de, bi şêweya ku di çêkirin û amadekirina xwarinê de, yan jî di nav xwarinê de be, bersiva “çi bi çi xweş e” daye. Ev rêbaz ji ber ku ji aliyekî ve alavên xwarinê, ji aliyekî ve şêweya çêkirina wê, ji aliyekî ve jî zewqa helbestvan nîşan dide girîng e.

**Patîle** digel rûnê teze, toraq û zehter.

**Sarmeya** pelên pincara spî ya di nav hêkan de hatî qelandin.

**Dolmeê balîcanan** ên bi birinc, qîme, don û pîvazan hatî çêkirin.

**Dolmê xiyaran** bi qîme û birincê.

**Sarmeya** bi hêk, rûnê zêde, tirşî, qîme û birincê hatî çêkirin.

**Zerabeta** bi mast, rûn û sîr.

**Kufteê navtiji** ku bi pîvaz, qîme, birinc, hinar û gûzan hatî çêkirin.

**Qapulmeya** ku di nav birinca wê de bîber, qîme û behîv û di fesla biharê de jî bexê miyan hebe.

**Tûtîkê xurmenav** ku di nav hevîrê wê de hêk û rûn hebe.

**Yûxeê Irtebê** ku di nav de hinarê tirş û pîvaz hebe.

**Zengilê** ku bi ava xûliyê hatî hilatin û hêk tê hebin.

**Borekên** ku digel rûn û pîvaz û qîmeya zêde hatî çêkirin.

**Helîsa** ku digel hêk û rûn û sîrê hatî çêkirin.

**Rîçala şufteliyan û ya buyokan** ku bi şekir û qerenfîlê yan jî bi dimsê hatî çêkirin.

**Peqlewa** digel badem û rûn û hingiv.

Wekî nimûne nivîskar li jêrê ji bo patîleyê wiha dibêje:

Tu behsê ji **patîleê** qenc bike

Çi reng tête xwarin zebanî veke

Digel rûnê teze û toraqa pak

Bi zehter welê qenc tenik be jî çak

Eger bête pehtin bi sêlê bixwu

We ger bi firinê ye esla mexwu

Eger nakî bawer ku **patîle** xweş

Bipirse ji şiblî efendiyê leş

Eger çend ji firnê dixwun daîma

Bi sêlê nizanin bipêjin Mela

Nivîskar di van formulasyonê jêrîn de jî, bi şeweya ku di menûya ser sifreyê de li kêleka hev bîna xwarin bersiva “çi bi çi xweş e” daye. Ev rêbaz jî ji ber ku hem zewqa

nivîskar û tama devê wî nîşan dide, hem jî ji ber ku çanda wê serdemê ya xwarinê nîşan dide girîng e.

Eşkera goştê xurt ê ciwan û nanê germ ê genim.  
Meftûne, goştê xurt û bulxur yan jî birinc  
Bizirkan aşî û pîlaw (ji neyîniyê)  
Toraq, rûnê taze yê biharan, nanê buxde û dewê sar  
Hêkê taze, pîvaz û nergûz.  
Penîrê Qerecdaxê, nanê genim û zebeşê çem.  
Qelî û pîvaz.  
Qelîsêl û yûxê ji nan.  
Sîrima biav û bulxur.  
Lûle kebabî, buxdenûs, bîber û pîvaz.  
Kufteê navtîjî û bîber.  
‘Eqîda şikeftan û rûnê taze yê biharan.

Wekî nimûne li jêrê formulasyona “meftûne, goştê xurt û bulxur yan jî birinc”ê hatiye dayîn ku ev di çanda Kurdan de menûyeke binirx tê qebûlkin:

Çira behsê nakî ji **meftûneê**  
Beyan ke hinek ne’te mesnûneê

Di ber de hinde goştê xurt ê temîz  
Digel **bulxurê** zêde xweş e lezîz

Eger ba **birinc** bit didit lezzetê  
Didit merdumanê deîf quwwetê

Nivîskar her weha behsa tiştên ku bi hev re nayên xwarin jî kiriye. Bo nimûne;  
Penîr peqlewasî bi şekir û hingiv re nayê xwarin  
Penîr borekî bi germî xweş e, lêbelê eger bi hingiv û sar be nexweş e.  
Qedaîf bi gûz û penîr xweş e, lêbelê eger bi hingiv û bi dimsê be nexweş e.

Rêbaza sêyem a ku nivîskar di vegotina xwarinan de şopandiye, derbirîna çêj, tam û lezzeta xwarinan e. Nivîskar ev yek bi peyvên wekî “nevîs, xweş, lezîz, keleş,

qûtê dilê min, zî huner (xwedî huner), benimdir benim, seza ye, el-eman” ifade kiriye. Her çiqas piraniya xwarinên ku wî behsa wan kiriye, li gorî çêj û zewqa wî ne jî, lêbelê hin xwarin hene ku nivîskar bi taybetî bi ifadeyên çêjê ew anîne ziman. Xwarinên bi vî rengî jî ev in (li gorî rêza alfabe): Balîcanê siyah û diraz, bîlî baxleya, borek, bûşkelen, dolmê xiyar, dolmeê balîcanan, ‘eqîda şikeftan, fincan boregî, qelî, mafîş, musaqa, patîle, qalib, Şamboregî, tûtikê xurmenav. Li jêrê di vê babetê de nimûneya “fincan boregî” cih digire:

Kezalîke **fincan boregî** îmam  
Dixwazim di sufrê ewê ez mudam

Penîr(i) lê ke hêj xweş e bêguman  
Seza ye ku bê sufreya hakimî

Nivîskar, xwarinên herî zêde xweş şibandine şah, wezîr û mîran. Di van beytên jêrîn de “qalib” şibandiye şah, “musaqa” jî şibandiye wezîr:

Wuha reng e **qalib** ku şahu’l-hevîr  
Digel hingiv û hêk û rûnê kesîr

--

Wezîr e di sufra emîran bizan  
**Musaqa** ji wan jî leziz e çunan

Nivîskar di berhemê de behsa xwarinên ku ji lezzeta wan hes nekiriye jî kiriye û di vê mijarê de peyvên wekî “tolaz, el-eman, bedekil, ‘eynê emrad (nexweşî bi xwe)” û bi taybetî ifadeya “qeda lê kevê”, yan jî “qeda be” gelekî bi kar aniye. Di vê çarçoveyê de xwarinên ku nivîskar ji wan hes nekiriye ev in: Bamiya, beqle, ekmek balixî, mafîşa virîk, rîçala kundiran, tirşiya kundiran, qatqat. Bo nimûne:

**Mafîş** jî xwuş e lê bi rûnê şirik  
Qeda lê kevê ger bixwî wê virîk

...

Tu behsê ji **patîle**ê qenc bike  
Çi reng têtê xwarin zebanî veke

Digel rûnê teze û toraqa pak  
Bi zehter welê qenc tenik be jî çak

Eger bête pehtin bi sêlê bixwu  
We ger bi firinê ye esla mexwu

### 8. 3. 4. Çanda Xwecihî

Di simatîyeya Şêx Muhyedîn de behsa gelek xwarinên xwecihî yên Kurdan jî hatiye kirin. Dikare bê gotin ev xwarin vedigerin demên berê yên civaka Kurdan û ji wan deman jî gihîştine heta roja me. Xwarinên wekî “boranî, gebol, gûriz, helîse, hevrişika nanê germ, kardû, kereng, keşke, kuvteê navtîjî, mehîr, meşlûlê hêjîran, qelîsêl, serbi-mastik, sîrim, zengil, zerabet (zerfet).” di vê çarçoveyê de dikarin bên nîrxandin.

Hin xwarin jî bi taybetî bi herêma Diyarbekirê têkildar in. Dema nivîskar behsa zebeşê çem dike, em dizanin ku ew, zebeşê Diyarbekirê yê navdar e ku bi awayekî taybet li ber çemê Dîcleyê dihat gihandin. Penîrê Qerecdaxê jî yek ji wan pêxwarinan e ku bi taybetî herêma Qerecdaxê ku nêzî Diyarbekirê ye nîşan dide:

**Penîrê Qerecdaxê** nanê genim  
Digel **zebeşê çem** benimdir benim

Herweha nivîskar behsa xwarinên Kurdan ên jiyana gundewariyê jî dike ku ev jî parçeyekî girîng ê çanda Kurdan e. Qeliya ku koçer ji pezê xwe yê ku li zozanan qelew dibin çêdikin û pîvazên wan ji bo vê yekê nimûneyeke xweş e:

Xwuş e **qel' yû pîvaza van koçeran**  
Digel **qelîsêlê** bi yûxê ji nan

Dîsa korelasyona toraqa bi rûn, nanê genim û dewê sar jî çandê xwecihî ya jiyana gundewariyê nîşan dide.

Wuha reng e **toraq** li ser deyne rûn  
Digel **nanê buxde** qe nade cunûn

We tasek **dewê sar** jî deyne li ber  
Bixwu û mekêşe tu esla keder

Bêguman ne tesaduf e ku Qedri Cemîl Paşa (k.d.1973) jî di çarçoveya çanda Kurdan de ji bavê xwe Ehmed Cemîl Paşa (k.d.1902) weha neqil dike: “*Heçî em Kurd in, em dew weha vedixwin.*” û dibêje ku dema bavê wî ev gotin digot hissiyatên

wî bilind dibûn û bi vî awayî hizrên neteweyî pê re çêbûn (Malmîsanij 2004, r.94). Naxwe eger di heman serdemê de yek ji burokratan, ê dî jî ji şêxan du rewşenbîrên Kurdan bi taybetî behsa vexwarina dew kiribin, ji vê derdikeve meydane ku vexwarina dew li herêma Diyarbekirê ku cihekî gelekî germ e, wekî meziyeteke neteweyî ya Kurdan dikare bê hesabandin.

## 9. ENCAM

Şêx Muhyedîn yek ji girîngtirîn helbestvanên serdema piştî mîrektiyên e. Di medrese û tekyayên Xalidiyan de ku sazîyên perwerdeyê yên serdema wî ne, perwerde bûye û di nav derdoreke edebî de cih girtiye. Nivîskar di berhemên xwe yên edebî de du mexles bi kar anîne: Sa'î û Heqî. Bi vî awayî di edebiyata Kurdî ya klasîk de ketiye nav kategoriya helbestvanên dumexlesî.

Nivîskar di du şaxên edebiyata klasîk de berhem dane: Helbestên klasîk û edebiyata ladînî/beşerî. Bi qasî ku diwançeyeye biçûk bînin meydane çend helbestên wî gihîştine roja me. Di van helbestan de li pey xeta Melayê Cizîrî performanseke girîng nişan daye û serkeftî ye. Berhema wî ya bi temaya xwarinê ku dikeve cureya simatiyeyê bi awayekî giştî di sahaya xwarinên Kurdan de û bi awayekî taybet jî di edebiyata Kurdî ya klasîk de yekem berhem e ku bi temaya xwarinê hatiye nivîsîn. Herweha, di edebiyata Kurdî ya klasîk de, pişt wî re jî berhemeke wekî wê nehatiye nivîsîn. Divê ev ji bê ifadekirin ku di dawîya sedsala XIXem de li Hênê Şêx Muhyedîn û li Aqtepeyê jî Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can bûne nûnerên bizava helbestnivîsiya bi temaya xwarinê.

Simatiyeya Şêx Muhyedîn ji aliyê ziman ve ji ber rewşa serdem û herêma ku nivîskar tê de jiyaye, ji Erebi û Farisî zêdetir di bin bandora Tirkî de maye. Lewra di berhemê de digel hin navên xwarinan ên tirkî, hin beytên Tirkî jî hene. Di berhemê de şewazên edebî yên ku ji mijarê neşet dikin hatine bikaranîn. Wekî zimanekî bicoş, mîzah, tekrîr, hizra sabit, nifir û heqaret, teşbîhên giran, zimanê bêperde û teşxîsê.

Berhem bi qasî 20 kom û 130 cureyên xwarinê di xwe de dihewîne ku ev ji aliyê jimara xwarinan ve asteke ne kêma e. Nivîskarê berhemê jî ber ku xelkê herêma Diyarbekirê ye bi awayekî siruştî zêdetir behsa xwarinên wê herêmê kiriye. Loma berhem ji bo çanda xwarinê ya herêma Diyarbekirê çavkaniyeke girîng e. Di berhemê de hin xwarinên Kurdan ku îro navên wan hatine jibîrkirin jî cih digirin.

Her çiqas berhem ne di formata pirtûkên popûler ên pênaseya xwarinan de hatiye amadekirin jî, di berhemê de hem derheqê pênaseyên gelek xwarinan de, hem jî derheqê menûya ser sifreyê de gelek agahî cih digirin. Loma berhem ji aliyekî ve

wekî yekem berhema pênasayên xwarinan ku bi zimanê Kurdî hatiye nivîsîn dikare bê qebûlkin. Berhem, ji bo sed sala modern ku ji gelek aliyan ve li ser çanda Kurdan lêkolînên tînin kirin wekî çavkaniyeye pêşserdemî dikare bê hesabandin.

Dema mirov van xalan tevan hizir dike, bi awayekî aşkera derdikeve meydana ku cihê Şêx Muhyedîn di nav edebiyat û çanda Kurdan de û cihê berhema wî ya bi temaya xwarinê jî di nav lîteratura xwarinên Kurdan de gelekî taybet e.

## 10. REFERANS

- Adak, A. (2012), "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri*, 05-06 Eylül 2008, (amd.) Ahmet Erkol-Abdurrahman Adak, Mardin: Mardin Üniversitesi.
- Adak, A. (2009) "Malbata Zêbarîyan û Basreta "Paytexta Neqşebendîyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbarîyan li Dergahê Basretê-" *Nûbihar*, j. 107, Stenbol.
- Amidî, Z. (1995). *Mecma'u'l-Kasâid*, (Nusxeya destxet a neçapkirî), Diyarbekir.
- Aqtepi, Ş. E. (1986). *Rewdu'n-Ne'im*, (amd. Mela Zeynelabidîn Amidî), Diyarbekir.
- Bender, C. (2003). *Kürt Mutfak Kültürü ve Kürt Yemekleri*, İstanbul: Berfin.
- Bingöl A. (2007). "Xwarinên Cizîrê" *Nûbihar*, sal:2007, jimar 103, Stenbol.
- Botî, M. M. D. (2007). "Fistiqên Sêrtê", *Nûbihar*, sal:2007, jimar 103, Stenbol.
- Erdoğan, K. (2003). "Z'atî Divanında Yiyecekler", *Atatürk Üniv. Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, jimar:22, Erzurum.
- Ergün, Z. (2014), *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Stenbol: Nûbihar.
- Findikî, S. E. (2011). *Dîwan*, (çapa pêncem), Stenbol: Nûbihar.
- Gökyay, O. Ş. (1997). "Divan-ı Et'ime", *Kim Etti Sana Bu Karı Teklif*, İstanbul: İletişim
- Güldemir, O. (2010) *Osmanlı Yemek Yazması Kitabüt Tabbahin'in Günümüze Uyarlanması*, Teza Lisansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Selçukê Enstîtuya Zanistên Sosyal, Konya.
- Hesbî, *Dîwan*, nusxeya destxet, pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak.
- Hênî, Ş. M. (2015). *Beyana Xwarinan û Zewqên Wan*, (amd. Mela Birhanê Tarîni), Stenbol: Peywend.
- Kaya, D., "Halk Edebiyatında Yemek Destanları", *Motif*, Ocak-Şubat-Mart 2007, s. 48, s. 4-11. [http://dogankaya.com/fotograf/halk\\_edebiyatinda\\_yemek\\_destanlari.pdf](http://dogankaya.com/fotograf/halk_edebiyatinda_yemek_destanlari.pdf) ( 20.11.2014).
- Korkusuz, Ş. (2004). *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, İstanbul: Kent.
- Malmîsanîj, (2004). *Diyarbakirli Cemilpaşazadeler ve Kürt Milliyetçiliği*, İstanbul: Avesta
- Maruf, H. Ş. bê tarîx, *Diyarbakır İlinin Hani İlçesinde Medfun Şeyh Ahmed Efendinin Tarihçeyi Hayatı*, (wer. Heybet Kanhan), nusxeya daktilyoyê, pirtûkxaneya A. Adak a taybet.
- Nalbend, E. (1998). *Baxê Kurda* (Amd. Teha Mayî), Dihok: Çapxana Xebat.
- Sêrtî, M. X. (2002), *Nehcu'l-Enam* (amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu), İstanbul: Enstîtuya Kurdî.
- Şîrazî, E. Î. H. (1302). *Dîwanî Et'ime*, İstanbul: Çapxaneî Ebuzyiya
- el-Xanî, E. b. M. (-). *el-Hedaiq'ul-Werdiyye fî Heqaiq Ecilai'n-Neqşebendiyye*, (Belavker: Ebdulwekil ed-Derûnî), Dimeşq.
- Yıldırım, K. (2011). *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, İstanbul: Ağrı Kültür Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği.



## Extended Abstract

Sheikh Muhyeddin Heni is from Hani, a town of Diyarbakır district. He lived in the second half of XIXth century and he is one of the most prominent representatives of Kurdish (kurmanci) classical literature. In his lifetime, the Kurdish Principalities had not survived any more, hence he is among the poets of the period of after principalities in terms of the history of Kurdish literature. In that period, the Khalidy branch of the classical Nakshibedi sect had spread and opened dervish lodges and madrasah nearly every corner of Kurdistan, and Kurdish literature improved in those lodge and madrasahs. Sheikh Muhyeddin's father, Sheikh Ahmad-i Karazi had studied by side of Sheikh Salih-i Sipki in Basret, one of main lodges of Khalidy; afterwards he opened Khalidy lodge and madrasah firstly in Karaz, then in town of Heni. Sheikh Muhyeddin took first part of his education in Mardin, but he took majority of his education by side of his elder brother Sheikh Maruf, the mudarris(lecturer) of their madrasah in Hênî. Like other poets of that period, Sheikh Muhyeddin Heni was a man of letters of Khalidy lodge and madrasahs which were represented by his father and elder brother. Sheikh Muhyeddin-i Hênî also had literary exchanges with the member of Aqtepe family (Sheikh Abdurrahman-i Aqtepi and Sheikh Mihemed Can-i Aqtepi) who opened a Khalidy lodge in Aqtepe village of town of Çinar of Diyarbakir district.

Sheikh Muhyeddin who used Sa'i and Heqî as pen names, wrote his literary works in two types. In one hand he continued the type of classical poem, on the other hand he wrote a poem on the food theme (or with its classical name, *simatiye*). As we learn from the members of his family, Sheikh Muhyeddin's diwan of classical poems was lost during the earthquake of Lice in 1975. Only 5 of his classical poems could survive till today. What makes Sheikh Muhyeddin Heni prominent in the history of Kurdish literature is his poem on food which is of *simatiye* type. In Kurdish literature, classical poem and lodge/sufist poem is very advanced, however the secular literature or social/humanist area is not as advanced as sufist poem, therefore that artifact has high prominence.

As far as is known, before Sheikh Muhyeddin Heni, no work or poems were written directly on the theme of food in the Kurdish literature. Only in some parts of some artifacts that written in different purposes, such as Mem û Zin of Ehmed Xani and Nehcu'l-Enam of Mela Khalil Serti, the theme of food is handled. However, during the period of Sheikh Muhyeddin, along with him, two members of Aqtepi family, Sheikh Abdurrahman Aqtepi and Sheikh Mihemed Can Aqtepi also interested in that theme. Hence, it is possible to speak of a movement of writing poem on food in two lodges of Khalidy around Diyarbakir. Yet, Sheikh Muhyedin must be seen the major representative of this type as he wrote an independent artifact on the food theme. Our argument is that, as some artifacts were written on food in Ottoman during that period, their effects could be seen in Kurdish literature.

The original manuscripts of that artifact is by side of Mela Zeynelabidin Amidi. The artifact published firstly in Arabic alphabet by Mela Zeynelabidin Amidi in Diyarbakir, then in Latin alphabet by Mela Birhan Tarini in Istanbul. Because of the long-drown out dominance of Turkish culture in Diyarbakir, the effects of Turkish on the language of the artifact is greater than the effects of Arabic and Persian. Among the leading aspects of the style of the artifact are a vivid language, humour, repetitions, personification, fixed ideas, insultations, sharp comparisons and an obscene language.

Nearly 20 groups of foods and 130 types of dish of those groups are being narrated in the artifact. The palatal delight of the writer is the main frame of the artifact, however as the ingredients and menu

of the dishes are being presented, that artifact could be seen as a cookbook. Moreover, this artifact is prominent as it shows the oblivion kitchen of both Diyarbakir and Kurdistan. With this artifact, the history of the books of the Kurdish kitchen retrace minimum 100 years, formerly the *The Kurdish Kitchen Culture* of Cemşid Bender which was written in 2003 was accepted the first book on the Kurdish kitchen. As the works on Kurdish culture are relatively written in modern period, that work of Sheikh Muhyeddin is a futuristic one.